

# ŞOREŞA BÊNAVEBIRR - I



## ŞOREŞA BÊNAVEBIRR - I

### PÊŞEKÎ:

Di çeprewiya welatê me de bêserûberiyêke mikum serwer e. Wisa ku hindêk fraksiyonên oportunist yê ku heman dakokiyên wekû bingeh bi kar dihênin û bi embelajên ji hev cuda dihajon piyasê, ji bilî hêza xweya nemaze piştî xwe didin hêzên hinekî din, bi şeweyekî herî tund hev bi oportunîzmê, bi pasîfîzmî, bi xiyaretê û bd., gunehkar dikin. Di navbera xwe de, li derdora cudayiyên şewe, yan jî, nîrxandinên biçûk ku ne hêjayî cudahiya taktîkan e jî, bagêran radikin.

Nakokiyên qaşo bîrdozîne ku dihêne kirin, şelûkirinên naşermane, kazekazên birjûwaziya biçûk, di nav toz û dûmana qurretîyên “em ji berê dizanin” de gengeşeyêke ku bi salan e didome.

Li welatê me, di encama nebûna bizaveke proleter de, di çepgeriya me de, astê bîrdozîyê ne bilind e. Ji ber vê çendê, di jîwarekî wisa de, rast û xwar ji hev nahêne cudakirin; her tişt tevlihev bûye. Û di vê rewşa ku teoriya şoreşa Marksîst-Lenînîst naveroka xwe wînda kiriye de, bi şeweyê rûxsariya oportunîzmê teoriyên “şoreşê”, li ser navên Marks, Engels, Mao-Tse Tung, Ho Chi Mînh.; bi nivîsên wan ve peywendîdar dihêne amadekirin û derdikevin piyasê. Wisa ku yek ji rengê oportunîzmê nivîsên Lenîn wekû çavkanî bi kar dihêne û aliyê din bi xiyaretê

tawanbar dike, aliyê din jî nivîsên Mao û Lin Piao wekû çavkanî nîşan dide û aliyê ku ew tawanbar kiriye ew jî wî bi revizyonîzmê tawanbar dike.

“Marksîzm, rêzaniyeke gelekî tevlîhev û gelekî kûr e.”

Marksîzm, rêzaniyeke berdewam ya ku li hember rastiyên nuh yê jiyanê kûr dibe, zengîn dibe û ji xwe jî berfirehtir dibe.

Di Marksîzmê de ya ku bingeh e ne gotinin, naverok e.

Di Marksîzmê de tiştek tenê ya ku nahête guhertin, bi gotina Lenîn; giyanê wê yê herî zindî azîna diyalektîkê ye.

Du hêmanên Diyalektîkê yê ku herî bi hev re pelçimbûyîne, heger têgehên zeman û mekan ku nehêne berçavkirin, di nerîna Marks û Engels de ya Lenîn, di nerîna Lenîn û Stalîn de ya Mao Tse Tung û di nerîna Mao de jî, dibe ku revîzyonîstiya serkeftiyên şoreşgerên proleter yê sêyemîn serdema qeyrana emperyalîzmê bihête axaftin.

Oportunîzm li her derê û li hemî deman di şêlûkirina sosyalîzma zanistî de serî li du azînan dide: Yan bêyî berçavkirina têgehên zeman û mekan, bi her du destan xwe dihavêje ew nerînên di jiyana îroyîn de kevnûyî yê Marksîstzanên ku ji bo helûmercên mêtûyêke din dane pêş û dixwaze van nerînan ji bo çewtiyên xwe wekû palpişt bi kar bihêne, yan jî nerînên Maksîzm-Lenînîzmê yê ku di hemî helûmercan de derbas dibin, bi gotina “zeman û mekan hatiye guhertin” Marksîzmê revîze dike.

Mîna li hemî welatên cîhanê, li welatê me jî her şeweyê oportunîzmê, digel şêlûkirina Marksîzm-Lenînîzmê, bi serîlêdana her du azînan dixwaze serê gernasên şoreşger tevlîhev bike.

Gava me dest bi nivîsîna vê namîlkeyê kir, bi taybetî me ev rastî berçav kir. Têgehiştina şoreşê, bi vê yekê ve girêdayî, rêxistin û têgehîna me ya şeweyê xebatê, teoriya şoreşa Marksîst, bi daxuyaniya şopandina rêyêke ku wê çawa bi demê re zengîn û niştecih bibe, me xwest derbixin holê.

Ew bixwe di raveyên sosyalîzma zanistî de bi gelemperî ne ji neyînê bo heyînê, ji ravekirinên heyînêberew neyînê çûyîn heye. Lê çepgîriya welatê me pêdivî bi rewşeke taybet heye.

Wekû li silal jî me daxuyakirin, di hebûna tevliheviya teorîk ya di nav çepgîriyê de naveroka rêzaniyê winda bûye. Ji ber vê çendê, bi destpêkirina ji neyînê ya ser ji nuh de, digel nirxandina bijardeya kûrçûna bûyerê bi demê re, ji bo daketina heyînê me biryar da.

Her wisa bi vê çendê, ev teoriya şoreşa Marksîst ya ku naveroka wê di nav kêşmekêşiyê de winda bûye emê derbixin holê, ya duyemîn jî, bi nakokiyên her şêweyê oportunîzmê re goya bîrdozîne ku serê hevalên me yên gernas tevlihev dikin, emê bikarin bi şêweyekî berfireh bibin asteng.

(Astengkirina şêlûkirinên oportunîzmê bi gelemperî helbet ne gengaz e. Belê, dibe ku bûyer bi gelemperî derbikeve holê û ev jî, şêlûkirinên oportunîzmê bi berfirehî bê bandor dike).

Ji ber van egeran, me di ravekirinên xwe de azîneke ji neyînê berew heyînê şopand.

Me lêkolîna bûyerê li ser sê beşan kir. Beşê yekemîn, serdemên Marks, Engels û Lenîn, di nav teoriya şoreşa Marks de cih digre.

Beşê duyemîn, teoriya şoreşa bînavberr ya Lenîn her ji aliyê wî bi xwe ve kûrkirina di du taktîkan de; bikaranîna vê teoriyê di pratîka welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh de; şirovekirina ji hev cuda ya vê pêşniyara Lenîn ji aliyê komîntera li jêr rêveberiya Stalîn û Mao, di naveroka nerîna dûr ji riya kapîtalîst û beşên Teoriya Şoreşa Demokratîk a Netewî de heye.

Beşê sêyemîn jî, taybetmendiyên cudaker yên emperyalîzmê, pêşniyara Lenîn ya digel kûrbûnê û zengînbûna li hember helûmercên nuh û stratejiya şoreşa welatên nîv-mêtîngeh, şiroveyên revîzyonîst û yên şoreşgerên şoreşa Kubayê, beşên Riya Şoreşa Tirkî bi berfirehî pêk dihêne. Wekî din jî, di her beşê de, di bûyerên ku girêdayî mijarê de ne, hemî şêweyên rexnekirina oportunîzmê cih digre.

## **KURTULUŞ (RIZGARÎ)**

## **PÊNASEYA ŞOREŞÊ**

Teoriya şoreşa Marksîst hem nîşander (determînîst) hem jî vîndar (volantirîst) e. Ev her du alî tevahiyeke diyalektîkê pêk dihênin. Ji bo serkeftina şoreşê heyîneke

bingehîn merc e. Heger ji bo şoreşê hêzên rençber di astekî pêdivî (diyar) de bin, serkeftina şoreşê gengaz e. Her wisa teoriya şoreşa Marksîst, nîşander (determînîst)e.

Belê, tenha ji bo serkeftina şoreşê pêdiviyê hêzên rençber di astekî diyar de bin,gehiştina mercên heyber têrê nakin. Ji bo serkeftina şoreşê serdestiya raperînkariyê pêdiviyê. Her wisa jî, teoriya şoreşa Marksîst vîndar (volantirîst)e.

Ji bo desteserkirina rêveberiyê ji aliyê proleterya ve, divêt nakokiyên di navbera hêzên rençber û têkiliyên helberînê de bigehên astê dijberiyê, bigehên sînorê herî dawî.

(1\*) Proleterya, ya herî rast yekîneyên pêşrew ji bo ravekirina vê dijberiyê çînên şoreşger dikêşe aliyê xwe, berew pêş derdikeve, zordestî û zordariya dijberê xwe bi tundiya şoreşgerî têk dibe, pergala kevn ya dewletê ji hev belawela dike, serweriya xwe a siyasî (2\*) dadimezrîne, derbasî sererastkirina bingeha xwe ya li dûv serweriya xwe dibe û heta bi civaka bêtêkî şoreşê didomîne.

Şêweyê ku “Şoreş, bidestxistina desthilata siyasî ye; yan jî şoreş, derbasbûna ji rengekî helberînê bo şêweyekî dîtirî pêşkeftî yê helberînêye” dihête gotin, ev her du pênaseyên ku dihêne daberhevkirin, bi serên xwe hem rast in, hem jî kêr in; û ji ber ku kêr in jî şaş in.

Di teoriya şoreşa Marksîst de daberhevkirina dijberiyê wisa tune. Bûyera desthilatdariyê bûyera bingehîn ya her şoreşê ye, lê ne ya giştî ye. Danasîna şoreşê wekû “Desteserkirina desthilatê ya Proleterya û hevbendên wê”bi serê xwe kêr e û lewra wekû her kêr-danasînê şaş e. Di mêtîyê de digel ku proleteriyê desthilatî bi dest xistiye jî, mîna Komûna Parîsê, bêtêkî veguherîna civakê bi gelek hewldanên şoreşgerî rabûye. Li dûv vê nasandinê divêt em van bizavan hemiyar wekû şoreş bi nav bikin.

Her wisa, ji ber ku duyemîn têgeh jî kêr e, bijarde ne nîşandere. Li dûv danasînê, divêt em rêveberiya Bismarck ya ku Almanya bi “şoreşa ji jor ” ve ji feodalîzmê derbasî kapîtalîzmê kiriye wekû şoreşger bi nav bikin.

Têgehîna şoreşa Marksîst, pêşbîniya pêvajoya raperîneke berdewam û bêtêkî birr dike. Şoreş, bi alkariya şoreşgeriya gelêrî -ji jêr berew jor- ve, digel ji hevexistina pergala heyî ya dewletê, bidestxistina desthilata siyasî û bi navgîniya vê desthilatê-ji jor berew jêr- ve rêxistinkirina pergaleke helberînê ya hîna bi

pêşdetir e.

Ji dema ku çîna karker wekû hêzeke serbixwe derkeftiye piyaseya mêjûyê, di bizava sosyalîst de ladan ji teoriya şoreşê, berdewam bi mezinkirina yek ji her du bijardeyan, yan jî, bi şêweyê paşguhkirinê derkeftiye holê.

## **BEŞÊ YEKEMÎN:**

### **BERÎ PAWANGERIYÊ DI MARKSÎZMÊ DE TEORIYA ŞOREŞÊ**

#### **I. LI CEM MARKS Û ENGELS TÊGEHÊN ŞOREŞÊ**

Li cem Marks û Engels, şoreşa siyasî digel şoreşa civakî û şoreşa berdewam, em sê şêwe têgehên şoreşê dibînin. (Emê di sêyemîn beşî de li ser şoreşa berdewam rawestin.)

Di nerîna Marks û Engels de şoreşa siyasî, di nav wê pêvajoya mêjûyî ya desthilata siyasî de, ji bo rêveberiyê hîna pêşkeftîtir, derbasbûne digel sernigûnkirina desthilata paşverû ya heyî ye. Ji bo bizavek bibe şoreşa siyasî (3\*) girseyên cemawerî, bi kêmanî arasteyî desthilatê hebûna tekoşînê merc e. Lê di encama serhildana cemawer de, heger desthilat bikeve destê şoreşgeran, wê hingê dibe ku wek şoreşa siyasî bihête dîtin. (4\*)

Ya duyemîn, di nerîna Marks û Engels de, ji bo bizavek wekû şoreşa siyasî bihête dîtin, ew rêveberiya ku di encama vê bizavê de pêk hatiye, demokratbûn û pêşverûbûna wê merc e. Ev nasandina Marks bi civaka birjûwa ya berî serdema pawangeriyê ve peywendîdar e.

Pîvana pêşverûtiyê li cem Marks û Engels gelekî balkêş e. Wekû pîvana pêşverûtiya bizavekê, Marks dibêje:

“Qerzdayîna giştî û qerzdayîna taybet, ji bo pîvana tundiya şoreşekê pîvanên aborî ne. Temet astên ku ew dikevin hêza rûxandina şoreşê û afirandina wê bilind dibe.” (Tekoşîna çînatî ya li Frensa, rûp:53) (5\*)

Tenê û tenê rêveberiyek dikare derba mirinê li qerzdanên giştî û taybet bixe; ew jî, rêveberiya proleterya ye. Ji ber vê çendê, li ser zemîna civaka birjûwa ya ku di

rûxandin û afirandinê de xwedî hêza herî bilind e, şoreşa siyasî, şoreşa proleterya ye. Ev şoreş her wisa veguherîna civakê jî pêk dihêne (Şoreşa Sosyal).

Ji ber ku ev şoreş, dê qerzdayîna birjûwa û borsayê ji holê rake. Ev jî, rabûna rejîm û helberîna birjûwa ya ji holê ye; derbasbûna pergaleke aborî û civakî ya nuh e.

Şoreşa 18`ê Reşemehê, şoreşeke siyasî ye. Şoreşa ku Arîstokrasiya darayî kir amanc, derba mirinê li qerzdayîna giştî û ya taybet nedaye, lê ew sînordar kiriye. Reşemehê dawî li rejîma birjûwa nehênaye, tenê dawî li beşekî rêveberiyê yê paşverû aniye. Çarçoveyamafên demokratîk û azadiyan berfireh û kûr daxistiye.

Şoreşa Reşemehê, ji ber ku dawî li rejîma birjûwa nehêna, ne şoreşeke civakî bû; lê, di encama serhildana cemawer de, ji ber ku rêveberiya herî paşverû ya arîstokrasiya darayî hate rûxandin û li şûna wê rêveberiyêke pêşverû ku derbirrîna xwe di komara sosyal de dibîne û ji ber ku rêveberiyêke pêşkeftîtir li ser kar e, şoreşeke siyasî ye.

Nasandina şoreşa civakî ya Marks jî, (Ji vêya re şoreşa rasteqîn dihête gotin), ji şêweyê helberînekê derbasbûna şêweyê helberîneke hîn pêştir ji xwe re bingeh digre.

Di vê mijarê de Marks dibêje:

“Di qonaxêke diyar ya pêşdeçûnan de, hêzên helberîna heyî yên civakê, heta bi gava ku di nav têkiliyên heyî de tevbigerin, yan jî, di derbirrîna yasayî ya wan de ku ji bilî têkiliyên milkiyetê pê ve ne tiştekî dîtirin, dikevin nakokîyan. Ev têkilî, ji şêweyên ku derencamên pêşdeçûna hêzên helberînêne derdikevin û li pêşberî vê pêşdeçûnê dikevin warê astengkirinê. Ewê hingê şoreşa civakî dest pê dike. Guherînen bingehîn yên aborî, sergeha mezin, bilezeke kêr yan zêde dirûxîne. Di lêkolîna rûdana van serûbinkirinan de, berdewam digel rûdana serûbinbûna heyîne ya helûmercên aborî -ku ji layê zanistî ve misoger dihête destnîşankirin-yasayî, siyasî, ayînî, artîstîk yan jî, şêweyên wê yên felsefî, bi kurtayî, serwextbûn û têgehiştina mirovan ji vê pevçûnê û ji hev cudakirina şêweyên bîrdozîbirina heta bi dawî, pêdiviye.., bêyî pêşdeçûna tevaya hêzên helberînê di nav de, pêkhatineke civakî hergîz bi dawî nahê; têkiliyên nuh û helberîna hîn bilindtir, bêyî geşbûna gulê ya di sînga civaka berê de, mercên hebûna şênber(maddî) yên van têkiliyan hergîz cihêxwe nagirin.” (Beşdariya Rexneyên Siyaseta Aborî, rûp: 23-24)

Wekû yekser dihête dîtin, di teoriyên şoreşê de aliyê ber bi çav yên Marks û Engels, nîşanderiya (determinîzm)aborî û civakî ye. Rola vîndar (volantirîzm) ya di nav çarçoveya nîşander a mercên şênber de ye. Li dûv vê têgehiştinê, şoreşa siyasî, berdewamiya şoreşa civakî ye. Şoreşa siyasî, di nav çarçoveya nîşander a mercên şênber de, berhemê karbidestiya raperînkare. (Gava Şoreşa Proleterya dihête gotin, mebest jê Şoreşa siyasî û Civakî ye.)

Heger em li ser hêmanan dabeş bikin:

1) Şoreşa siyasî, qonaxeke pêdivî ya şoreşa civakî ye.

Şoreşa siyasî berhemê pêngava raperînkare. Şoreş, karê rêxistineke ku cemawer bi dûv xwe radikşîne, têgehiştî û dizane wê çi bike. Bi taybetî, ji bo şoreşa siyasî ya ku wê rê li ber veguherîna sosyalîst veke, ev wisa ye. Xwedî rêkûpêkxistineke polayî, rêxistina pêkhatyekê ku cemawer têdigehe, digel bilindkirina astê çalakî û têgehiştina cemawer, di cih û dema xwe de bikaranîna destkariya raperînkare şoreşa siyasî dike û veguherîna sosyalîst pêk dihêne. Şoreş di encama çalakiyên cemawerê têgehiştî de dibe û piştî xwe dide cemawer. Lê di vir de, pêngava raperînkare ya rêxistina raperînkare ku pişeya wan şoreşgeriya berteng e, xwedî girîngiyeke jiyaneve ye. (Kesên pasifîst, rola karbidestiya raperînkare berdewam biçûk dikan.)

2) Ji bo ku şoreşa siyasî veguherîna civakê pêk werîne (Ji bo serdema berî pawanê dihête gotin. Lê, ji bo di serdema me de şoreş were li darxistin), ango, ji bo şoreşeke civakî li dar bikeve, ji aliyekî mercên mêjûyî, digel têrêkirina bingeha civakî û aborî, ji aliyekî din ve jî astê têgehiştina girseyên gel û rêxistinê divêt bilind be.

Rola nîşander ya şoreşa civakî, karbidestiya raperînkare bi tena xwe nalîze. Ne leheng mêjûyê, mêjû lehangana diafirîne. Mêjûya şoreşan, sererayî bidestxistina desthilatîyê, ji ber kêmgoncîna helûmercên heyber (sererayî hemî şeweyên lehengiyan) dawîhatina karbidestiya raperînkare bi sernigûnan dagirtîye.

Ji bizava Munzer, ji Şêx Bedreddîn heta bi Komûna Parîsê, mêjû, ji bo têkçûnên karbidestiya raperînkare ku bi bingehe şênber yê rûdanê wê serdemê re negonciyane, bûye şanogeh.

Pêngava raperînkare ya di serdemeke diyare de, çend bi hêz dibe bila bibe, heger ew serdema mêjûyî rê li ber encamdana serkeftinê digre, mercên jiyane şênber, ji

bo gehiştina serkeftina vê pêngavê ne gehiştibe astekî diyar, têkçûn encameke misoger e.

Hevgirtina diyalektîka di navbera karbidestîya raperînkariya ya digel mêjû û nîşanderiya (determinizm) civakîde, di ravekirina bizava Munzer de, Engels bi şêweyekî herî hinermendane li ber çavan radixe:

“Bobleta herî mezin ya ku wê bihête serê serperîştê partiyeke tundrew (di wateya negoncîna wê serdema mêjûyî de dihête bikaranîn), berî bidestxistina desthilata çînatî ya ku ji aliyê vê bizavê ve nûnertiya wê dihête kirin û temet wergirtina berhingariyên pêdivî ji aliyê desthilata vê çînê ve ku hîna di demeke ne stewiyayî de gava ev bizav duçarî desthilatdariyê dibe.

Tiştê ji dest vî serperîştî dihêt, negirêdayî vîna wî ye. Dibe ku evqonax, bigehiştina dijberiyêndî navbera çînên ji hev cudaû di astê pêşdeçûna pevçûnên li navbera çînan de û bi astê pêşdeçûna derfetên serbiserkirina dahatiyan digel derfetên qezenca maddî û bi astê pêşdeçûnên dijberiya çînatî ku hemî gavan helûmercên jiyara maddî destnîşan dikin ve girêdayî be, her wisa, ew li hember tevliheviyeke ku çareserîya wê ne gengaz e rûbirû dimîne. Tiştê ji destê wî tê, dijberiya tevaya çalakiyên xwe yê rabûrî, dijberiya prensîbên xwe û dijberiya berjewendiya partiya xwe a rojane dike. Tiştê ku wê bike jî, tiştê e ku rastgerîna wê ne gengaz e.” ( Li Almanya Cenga Gundîyan, rûp. 127)

Di teoriya şoreşê de Marks, nakokî û têkiliyên di navbera nîşanderiya (determinizm) civakî û karbidestîya raperînkariya ya aborî de, bi vî rengî li ber çavan radixîne:

“Her kes mêjûya xwe bi xwe durist dike; lê ne li dûv dilên xwe û li dûv mercên ku ji aliyê wan ve hatine helbijartin, ev di mercên ku rabûriyê yekser daye û wekû mîrat hiştiye de, dibe.” (Darbeya Louis Bonapart, rûp.21)

Û Marks, li dijî paşverûyên ku raperînkariyê wekû karê hindek gellacan pênase dikin, sedemê raperînkariyê wisa şirove dike:

“Serdema ew baweriyên batil ku raperînkariyan wekû berhemê vîna hindek gellacan nîşan didan, derbas bûye. Li her cihekî ku lertzîna raperînê rû daye, êdî her kes dizane ku ev lertzîn ji pêdiviyên civakî ku ji layê saziyên berê ve bersiveke erênî nahête dayîn, dihêt.” (Ji axaftina Marks ya li pêşberî endamên sazûmanîya dozgeriya Kolonya, 1851, çavkanî Henri Lefebvre, sosyolojiya Marks, rûp. 189).



Bûyer diyar e. Ji bo karbidestiya raperînkari di rola xwe de bi ser bikeve, niştina şoreşê li ser hîmekî şênber merc e. Bi gotinek din, ji bo serkeftina ew pêngava raperînkari pêdiviyê bingehgehiştibe astekî diyar:

“Ji bo şoreşan bingehke maddî pêdiviyê. Raman, heta ku nûnertiya pêdiviyên xwe neke, di nav gel de cih nagire. Arastebûna hişmendiyê berew rastgerîna têrê nake, divêt rastgerîna arasteyî hişmendiyê bibe.” (Marks)

## II. QONAXA ŞOREŞÊ, QONAXA WERARÊ Û TEORIYA QEYRANAN

Marks ji Engels re; “Gava pêşdeçûnên mêjûyî yên mezin dibin mijara axaftinê” wisa dinivîse, “Bîst sal rojek jî nahête heljmartin, lê paşê dibe ku rojên bîst salên dirêj kom kirine jî bihên.” (Lenîn, taktîka tekoşîna çîna proleter, çavkaniya Marksîzmê, rûp.44).

Marks û Engels, tekoşîna şoreşger ya proleteriyayê li ser du qonaxan, wekû qonaxên werar û şoreşê şirove dikin.

Di her du qonaxan de jî, taktîkên şoreşgerî yên proleteriyayê ji hev cuda ne.

Qonaxa şoreşê demeke kurt e. Ev qonax, qonaxa heyî serûbinbûna pergala sosyal e. Di vê kurteqonaxê de, taktîka proleterya û pêşrewiya wê, hêriş e; di rojevê de, tenha bendek nivîskî heye: SERHILDAN! Taktîka proleteriyayê ya di vê demê de, digel parçekirina pergala heyî ya dewletê, damezrandina desthilatdariya proleterya a şoreşger e. Marks û Engels ji bo vê taktîkê, pêngava raperînkari ya Frensiyan û li ber ronahiya gerdiş û rewîştên wan wekû “axaftina bi Frensî” binavkirine.

Di nerîna Marks û Engels de serhildan pêşeyek e:

“Di roja me de serhildan bi rastî jî pêşeyek ji şêweyên cengê ye û gava bihête paşguhkirin jî, bi prensîbên ku dê bibe sedemê nemana ew partiya ku paşguhkirye ve, girêdayiye... Heger pêşî amadekariyên we yên rûbirûbûna bi encama yarîkirina we tunebe, bi serhildanê yariyan nekin... Ya din jî, heger serhildanê dest pê kir jî, di plana hêrişê de û bi şiyaneke herî mezin bi rê ve diçe.

Çalakiyê berevaniyê mirina her serhildaneke çekdarî ye...

Şarezayê herî mezin yê ku heta niha bi vê siyaseta şoreşger hatiye nasîn, wekû Danton dibêje: `Galkirin, galkirin û dîsa galkirin`. (Friedrich Engels, Germany,

Revolution and Counter-Revolution, International Publishers 1932, rûp: 100 (6\*)

Wekû dihête dîtin, bêyî stewîna mercan, hergîz nabe bi raperînê bihête yarîkirin. Lê, heger hat û rêçika raperînê vebû, ji bobêyî rawestan neçîrkirina dijmin û her wisa, çend biçûk dibin bila bibin, ji bo bidestxistina serkeftinên rojane, da bikarî kesên dudil bi aliyê xwe ve rakêşî, destpêkirina hêrişê û her wisa hêrişkirina ji nişka de merc e.

Taktîka proleterya ya di dema şoreşê de ev e.

Heta bi vê kurteqonaxa şoreşê, erkê yekîneyên proleterya yê pêşrew çî ye, gelo;niştin û rawestane? Helbet na, digel qonaxa şoreşê di vê qonaxa dirêjxayen ya derbarî erkên partiya proleter de, Lenîn nerînên Marks û Engels î bi vî rengî vediguhêze:

“Taktîka proleterya ya di hemî qonaxên werarê de, di her gavê de, ev diyalektîka ku ji aliyê heybergeriya di mêjûya mirovahiyê de misoger e, divêt bihête berçavkirin. Li aliyekî, di rewşa rawestana siyasî de, ango -sûdwergirtina bêyî pêşdeçûna di nav aştîyê de, têgehîna çîna pêşrew, digel zêdekirina hêz û şerzanîna wê, pêşdeçûna bi pêngavên Kîso; li aliyekî din jî, sazîkirin û arastekirina vê xebatê berew amanca amadekirina çîna pêşrew, çîna karker, di hundirê bîst salên dirêjxayen de, ji bo biserxistina karên berbiçavdi karên mezin de, pêdivî ye.”  
(Taktîka proleterya ya tekoşîna çînatî, Çavkaniya Marksîzm, rûp: 44)

Tekoşîna şoreşger ya vê dema dirêjxayen, di hundir de dayîna tekoşîna bîrdozî ya dijwar li hemberî oportunîzmê, rahênan û bilindkirina têgehîna çîna pêşrew û hêza wê, li derve jî, ji tekoşîna sendîkayî ya proleterya bigre heta bi tekoşîna demokratîk û aboriya cemawerî, bi rêxistinkirina tekoşîna rojane ya cemawerî, li dijberî rêveberiya heyî ya paşverû, bi girtina cihê xwe li aliyê herî çep yê di nav arteşa demokratîkde, heta bi arastekirina rikaberiya siyasî, hemî şeweyên çalakiyan di nav xwe de werdigre.

Marks û Engels, ji ber bilindbûna astê bîrdozî-teoriyê, proleterya Alman û ji ber hinermendîya wê ya kêşana girseyên gel bi aliyê xwe ve, ji zimanê şoreşgerî yê vê qonaxa proleterayê re; “Axaftina bi Germenî” gotine.

Wekû dihête dîtin, taktîkên proleterayê, li dûv rewşê û mercên berbiçav reng dide. Digel guherîna mercan taktîk jî dihêne guhertin. Şoreşgerê proleter, ew kes e yê ku her du zimanan di cih û di dema wê de bi kar dihêne.

Wekû Marks li ser zimanê Ludwig Feurbach: Şoreşger, ew şervanê ku “bi serê xwe Alman û bi dilê xwe Frensî ye” dibêje.

Partiya proleter jî, ji bizava biçûk a herî reformist heta bi gefxwarina şoreşgerî, hemî reng û şêweyan di cih û dema xwe de ya ku dike bûyera rojevê, rêxistineke şerzan e ku li ser bingeha dîyalektîk û materyalîzma mêjûyî hatiye damezrandin.

Bingeha tevaya ladanên “Çep” û rastgîr yên ku di bizava şoreşê dederdikevin holê, di van her du qonaxan de tevlihevkirina taktîkên şoreşgerî; di qonaxa werarê de, yan daxwaza bi axaftina bi Frensî, yan jî di qonaxa şoreşê de, rijdbûna li ser xîtaba Almanî û yan jî, di her du qonaxan de jî dihête wateya ku bi her du zimanan jî şikestî dipeyivin.

(Bi gotineke din, sedemê tevaya ladanên, du-aliya di teoriya şoreşê de, şirovekirina bi şêweyekî ne asayî, yan jî, bi paşguhkirina aliyekî ji aliyan gengaz e).

Marks û Engels, bi dirêjahiya jiyana xwe li dijî her du ladanên bi şêweyekî herî xurt tekoşîn dane. Li aliyekî Sosyalîzma Zanistî, li aliyekî din, berî stewîna mercên heyber daxwaza axaftina bi Frensî, dûr ji cemawer, planger, Blanquist, Bakunîstên ku dixwestin desthilatê desteser bikin û her wisa, komînîstên berelayî yên Alman ku ji aliyê Marks û Engels ve wekû sîmyagerên şoreşê hatine binavkirin, ji aliyekî din ve, digel reformîstên wek Proudhhonîst û Lacalleîst, li dijberî reformîstên birjûwa biçûk ya Alman û Îngîlîz ku dixwestin tekoşîna siyasî ya proleterayê, li dûv daxwazên kapîtalîzmê derbasî gorepanê bikin, bi dirêjahiya jiyana xwe Marks û Engels, bi dayîna tekoşîna bîrdozî-teorîk ya bi pratîka şoreşgerîpêk hatiye.

Ma hêmanên nîşander yên qonaxên şoreş û werarê çine? Ma navbêhnên şoreşê girêdayî helkeftinane? Helbet na. Yasayêke şoreşê heye. Marks û Engels qonaxa şoreşê bi qeyrana şoreşgerî ve girêdidin. (Ji bo şoreşê, asta rêxistin û têgehiştina proleterya jî, têrêkirin merc e.)

Têgeha qeyrana şoreşgerî li dev Marks û Engels jî, demeke dirêj nebûye xwedî têgeheke bijarde ya diyar û vekirî. Ji ber vê rewşa aloz ya têgehîna qeyrana şoreşger, rapera 1848`an wek Marks û Engels derneket.

Di Sosyalîzma Zanistî de, di bernameya qeyrana şoreşger de, hêmanên rengawreng wekû qeyrana aborî, qeyrana civakî, qeyrana siyasî û qeyranên

berdewam di nav xwe de xwedî dike.

Wekû li silal jî me da xuyakirin, teoriya van qeyranên di Sosyâlîzma Zanistî de, heta bi Kapîtalê, gelekî aloz e. Marks û Engels, di Rêbazê de; "Bi derkeftina wanî holê ya carcaran bîranîna qeyranên bazerganî ku hemî gavan hebûna civaka birjûwa dixwe metirsiyeke mezin, bes e" (rûp:54) dibêjin.

Ev qeyranên aborî ku di her gavê de metirsiya wan hîna jî zêde dibe, şelêlên dil in, yên kudê heta bi dawiya jiyana aborî ya birjûwazî bidome. Ev qeyran, her wisa dê bibin sedemên afirandina qeyranên civakî jî.

Belê ji bo serkeftina şoreşekê, hebûna van her du qeyranan ne bes e; Ji bo ku helûmercên heyber yên şoreşê bistewin, li rex qeyrana aborî, hebûna qeyrana polîtîk ya ku dê bibe sedemê têkçûna desthilata birjûwa (7\*) û kûrdaxistina qeyrana civakî merc e. (ji bo rûdana qeyraneke siyasî ya wisa jî, bi kûrdaxistina qeyrana aborî û ya civakî ve girêdayiye.)

Heger ev her sê qeyran bi vî rengî neghên sînorên dawî, şoreş bi ser nakeve. (Ji bo serkeftina şoreşê, stewîna helûmercên şoreşê yên heyber merc in.)

Di dema raperîna 1848 de, têgeha şoreşgeriya ku Marks û Engels bi kar dihanîn, qeyrana aborî û berfirehnebûna civakê radispêre. Dema ku raperîna 1848`an dest pê dike, Marks û Engels wisa dizanîn ku ew dema çav li rê hatiye. Û bi destpêkirina qeyranê re, wekû qeyrana berdewam û ya dawî ramiya bûn. Marks û Engels, bawer dikirin ku di van rojan de, bêyî vekşîn û rawestan, digel desteserkirina desthilata siyasî dê veguherîna civakî pêk were. Di vê mijarê de Engels dibêje:

"...Ji bo me wê hingê, di bin helûmercên têper de dawiya dawî tekoşîna mezin dest pê kiriye û di dema dirêj ya tevlîheviya şoreşê de (mebest şoreşa berdewam e) ji hebûna pêdiviya bi encamdanê û di dawiya dawî de encamdana bi serkeftina misoger ya proleteriyayê hîç gumanek tune bû." (Pêşgotina Tekoşînên Çînatî yên Li Frensayê, rûp:12)

Û dîsa Engels, di navbera salên 1848-50`an de, şaşbûna kesên ku wek wan diramiyan bi dilniyayî dibêje:

"Mêjûyê em û yên ku wek me diramiyan şaş derxist. Rewşa pêşdeçûna aborî ya li parzemîna Awrûpayê, daxuyakirin ku wê hingê gengaziya şeweyê rabûna

helberîna kapîtalîst ya ji holê,ji stewînê gelekî dûr e. (...) Û her wisa vegotina me ya vê demê, piştî bîst salên din jî, careke din dazanîn ku desthilateke çîna karker bê gengaz e.” (Berhema navbirî, rûp: 16-18, Hûn dikarin li pêşgotina çapa Ingilîzî mêjû 1888 ya Manîfestoyê -Rêbazê- binerin).

Di salên 1850`an de, Marks jî, derbarî têrênkirina mercên heyber û di şaşbûna bendewariya serkeftina şoreşeke proleter de, dibêje:

“Di nav dewlemendiyeke ku temet helûmercên birjûwa rê bide, digel hebûna gengaziya xweşiyeye giştî ya wisa de, vegotina şoreşeke durist nahête kirin. Şoreşeke wisa tenê bi hebûna ev her du kartêkeran, ango, gava hêzên berhemhênanê yên heyî, digel şêweyên berhemhênanana birjûwa bikevin rewşa pevçûnê, dibe ku bibe mijara axaftinê... Şoreşeke nuh, tenê li dûv qeyraneke nuh dê bihêt û hatina vê yekê çend misoger be, hatina ya dîtir jî hinde misoger e.” (Li Frensayê Tekoşînên Çînan, rûp: 159)

Li dûv dazanîna Marks, di navbera salên 1848-50 de, ji ber têrênkirina mercên heyber, her pêngaveke proleteriyayê her ku diçe lawaz dibe û vedimre:

“Ji ber ku her pêngaveke bizavê wekû serkeftinê xuya dibe, yê li pêşî xwest cihê xwe ji nuh de bigre (Proleterya) bû. Belê di her carê de hinekî din lawaz bû û di her carê de encama ku bi dest xist, bêhtir lawaz bû.” (Kutadaya Louis Bonaparte, rûp:28)

Piştî van derbirrînan hemiyan, Têgeha qeyrana şoreşger, ji yên di rêbazê de hîna bêhtir diyar dibe.

Wekû Marks dibêje, digel çawaniya berhemhênanana civakî,bêyî peydabûna dijberiya nakokiyên di navbera milkiyeta taybet ya navgînên hêzên berhemdayînê de,gava ku xwedî gengaziyên hêzên berhemdayînê ye, hebûna qeyranên demî yên aboriya kapîtalîzmê, rê li ber şoreşekê venake. Diyar e ku pergala berhemanîne gelemperiyeye diyalektîkî ye. Wekû her gelemperiyeye diyalektîkî, ev jî, yekbûnê, hevgerîna û her wiha cudabûnê û dijberiyê di nava xwe de zindî dike.

Ji aliyekî ve, di kêliya mêjûyek diyar de, têkiliyên berhemanîna heyî,goncîna wê ya digel hêzên berhemdayînê, qamçîkirina wan û pêşdebirina wan, ji aliyekî din ve, di kêlîkeke dîtirî mêjûyî de, berovacîketina wê ya digel heman hêzên berhemdayînê, rawestandina pêşdeçûna wan; diyalektîka pergaleke berhemî, aha ev bi xwe ye.

Ji nakokiyên bingehîn yên di navbera berhem û hêzên berhemdayînê de rêzepevçûn peyda dibin. Ev pevçûnan; di navbera rencderî û rencberiyê de aborî, di navbera çînan de, di navbera proleterya, kedkaran, birjûwazî û gelek aliyên di nav birjûwazî de, di navbera civak, proleterya û birjûwazî de, bi şêweyê tekoşîndayîna paraztin, yan jî, rûxandina pergale di çawanîyeke siyasî de ne.

Dema şoreşê, ji ber gehîştina sînore dawî ya ev nakokiyên bingehîn, pelçîmbûna rewşa sê qeyranan ya bi hev re, kûrbûna wan, ango, rewşa hebûna qeyrana şoreşgerî ye. Tenê bi hebûna rewşeke wisa serhildan dikare bibe mijara gotinê.

Marks (Li navbera 1848-50), ji bo berfirehbûna tekoşîna çînatî gehîştina (di wateya şoreşa cîhanî de) şoreşa Awrûpayê, hebûna cengeke cîhanî ku dê tevaya netewên Awrûpayê dijberî hev bike, bi merc dizane.

Yekemîn cenga cîhanî, bi temaşekirina rastiya rêvekirina şoreşa mezin ya proleterya cîhanî, ev ramana Marks, bi rastî jî kehanetê mezin, lê ne gengaz e ku meriv bibêje ne kehanetê zanistî ye. (Helbet rastnegerîna kehaneta Marks ya beşê derbarî ku pêşî şoreşê dê li Britanyayê bi ser bikeve û şoreşa proleterê dê tevaya welatên Awrûpayê vegire, rastiyeke berbiçav e. Lê, di vir de ya ku grîng e, çavdêriya cengeke cîhanî ya li navbera welatên kapîtalîst ku rê li ber şoreşa proleter vedike, dîtineke kahînanê ye).

Di vê mijarê de Marks dibêje:

“Tekoşîna çînanê di nav civaka Frensî de, bi dijberkirina hemî netewan wekû cenga cîhanî dê berfireh bibe. Li seranserî cîhanê ji hev ketinek, netewa ku serwer e di bazara cîhanê de, ango, li ser serê Britanyayê cengeke cîhanî, lewra di encama têperbûna proleterya de nêzîkbûn gengaz e. Li wir ne li dawîbûna xwe, şoreşa ku di destpêka rêxistinîna xwe de ye, ne bîhnkurt e. Nifşê îroyîn, dişibin ew Yahûdiyên ku Mûsa ew birin dêmistanê. Ne bes ji neçarî dagîrkirina cîhanê neuh e, ji bo vekirina cihekî ji mirovên ku dê bi cîhanê neuh re bikevin berebeziyê xwebexşandinê pêdivî ye.” Tekoşînan çînatî yên li Frensayê, rûp: 132)

Engels, evê kehaneta Marks ya derbarî yekemîn şoreşa proleterya de, piştî têperbûna bêhtir ji sîh salan di ser gotina Marks re, berî bêhtir ji sîh salan ji yekemîn şoreşa proleter, di 15`ê Berfbarana 1887`an de, digel sererastkirineke giştî, derbarî dema şoreşê de, şoreşgerên proleter yên bi dûv xwe de agahdar dike. (Tenê li Rûsyayê Lenîn digel Bolşewîkan tevî vê hişyarkirina Engels bûne).

Di vê mijarê de Engels dibêje:

“... Ji bo Prûsya-Fransayê, ji bilî cengeke cîhanî cengeke dîtir ne gengaz e û ev ceng heta bi îroyîn, bi tundî û bi berfirehiyeke ku nehatiye nîgaşkirindê rû bide. 8-10 milyon leşker dê qirra hev bihênin û her wisa bi şeweyekî ku colên kuliyan jî nikaribe dê heta bi wêrankirina tevaya Awrûpayê bi hêrs bixwin û daqurtînin. Rûxandina cengên ku di sîh salî de dibe, dê di 3-4 salan de rû bide û dê tevaya parzemînê vegire; birsîbûn, nexweşî, azar û têkçûna metirsiyêya di nav arteşan û gelan de ku gehîştîye sînore dawî; peydabûna tevliheviya bêhêvîtiyê ku di encama îflasa giştî ya pergala çekirî de, rûxîna felsefeya dewleta gerdişî ya digel dewletên berê ku di pîşesazî, bazerganî û bankageriyê de me damezrandibû, dê bikeve rewşeke wisa ku bi duzîneyan tac dê li ser pîrêkan bigendirin û nediyarbûna aliye serkeftî; tenê derencamek misoger diyar e: Mandîbûneke giştî û ji bo serkeftina yekcar a çîna karker amadekirina mercan e. Pergala berebeziya çakdarbûna hemî aliyan gehîştîye sînore dawî ku di encam de, dest bi berhemdayînê kiriye, rewş ev e... Ceng, demî be jî, dibe ku me bi paş bixe, dibe ku ji gelek çeperên bi destkeftî me derbixe. Lê hêzên ku hûn dê nikaribin bixin jêr kontrolê serî ji we bistînin, dibe ku her tişt li dûv daxwaza xwe tevbigere. Di encama dramê de, hûnê têk biçin û serkeftina proleterya bi dest dikeve, yan jî dibe ku (doch) bikeve rewşa misogeriyê.”(Lenîn, Ceng û Sosyalîzm, rûp:172-173)

### III. QEYRANA BERDEWAM Û TEORIYA ŞOREŞA BERDEWAM

Di pêvajoya payiza ji 1848`an heta bi 1850`yan, Marks û perspektîvên şoreşê yê Marks û Engels şoreşa berdewam e. Ev dîtina stratejîk derencama nîrxandina hele ya wê demê ye. Marks û Engels, nerîna li du qeyranên mezin yê di sala 1847`an de (Di 1847`an de, digel qeyrana çandinê qeyrana bazerganî û pîşesaziya cîhanî), dihate pêşbînîkirin ku êdî demjimêrên dawî yê kapîtalîzmê hatiye û di encam de tekoşîna mezin dest pê kiriye û her wisa, serdema şoreşên sosyalîst vebûye. Ango, Marks û Engels, qeyrana aborî ya kapîtalîzma cîhanî ku peqiyaye, qeyrana berdewam û ya dawî dizanîn. Aha ev teoriya şoreşa berdewam, berhema teoriya qeyrana berdewam e.

Di dema 1847-50`yî de, Marks û Engels, li dûv ramankirina ku di demeke nêz de şoreşa proleterya dê li Frensa û Awrûpayê encam bide, ji bo şoreşa demokratîk ya birjûwa ku li Almanyayê bi derengahî keftîye, dixwestin proleterya serperîştîyê bike. Di vê demê de, Marks û Engels, piraniya xebatên xwe yê teorîk û pratîk li ser Almanyayê çirr kiribûn:

“Kominîstan herî bêhtir bala xwe dabûn ser Almanyanayê. Ji ber ku ev welat, di mercên herî pêşkeftîtir yê şaristaniya Avrûpayê de, di sedsala XVII. de ji ya Brîtanayanayê, di sedsala XVIII. de ji ya Frensayê, digel ku proleteriyayê hîna pêşdetirbû, şoreşeke birjûwa ku divêt bihête kirin li ber dergehî ye û bi dûv şoreşa birjûwa ya li Almanyanayê, yekser dê bibe yekemîn pêngava şoreşeke proleter”. (Marks, Engels, Manîfesto, rûp:91)

Wekû dihête dîtin, pêşbînîkirina Marks û Engels ya ji bo şoreşa Almanyanayê şoreşa berdewam e. Û ev şoreşa berdewam, ne teoriya bêqonax, teoriya şoreşa qonax bi qonax e. Ev yek gelekî grîng e. Ev teoriya jiyanewerî ku Lenîn di serdema emperyalîst de bi kar aniye. Taybetmendiya bingehîn ya vê teoriyê ku ji teoriya şoreşa berdewam a Troçkîst cuda dike, ev e. Şoreşa berdewam ya ji bo Germenîstana 1849`an, ne bes Marks û Engels pêşbînî dikirin, Gosttschalk û alîgirên xwe jî pêşbîniya şoreşa berdewam dikirin. Lê, şoreşa berdewam ya wan yan bêqonax yan jî şoreşeke yekqonaxî bû. (8\*) (Biçûkdîtina potansiyela şoreşgeriya gundiyan, redkirina hevpeymaniyên proleteriyayê; naveroka vê teoriyê ev e) û li dijî pêşniyara Marks a şoreşa pirqonax [pêşî şoreşa birjûwa, paşê şoreşa proleter] bi tundî radiwestiyan: “Ji ber çi emê xwîna xwe birêjin? Li dûv daxuyaniya we, pendyar efendî (mebest Marks e), ji ber ku emê ji dojistana serdema navîn riha bibin.., meber bi aliyê kapîtalîzmê ve bazdabaya.”

Li hemberî nerîna Gottschalk û alîgirên wî ku bi damezrandina desthilata şoreşger yekser bi rêya şoreşa berdewam derbasbûna komunîzmê didan pêş, Marks û Engels, erkê “şoreşa dahatû” ya li Germenîstanê pakijkirin û nehiştina bermayiyên derbegatiyê û bicihkirina demokrasiya birjûwa ye, li dûv gotina wan; çipkirina di ser erkekî mêjûyî re derbasbûn ne gengaz e.

Di bingeha teoriya şoreşa qonax bi qonax de ya ku Marks û Engels pêşbînî dikirin, li Almanyanayê şoreşa vemayî ya birjûwa, digel dijberiya birjûwaziya lîberal ya proleteriyayê bi xwe, bi danandina peymanê ya digel demokratên birjuwa-biçûk û bêyî rawestana yekcar ya proleteriyayê û bêyî dabirîna şoreşê, ramana derbasbûna sosyalîzmê heye.

Li dûv vê teoriyê: Pêdiviyê burjûwaziya lîberal bibe amanc. Ji ber ku burjûwaziya lîberal newêrek û lawaz e, piştî bûyerên li Frensayê tirsiyayê û digel li hevkirina bi feodalan re xiyanet kiriye. Ji ber vê çendê, şoreşa burjûwa ya li Almanyanayê, tenha bi dijberiya burjûwaziya lîberal, ango, sererayî wî jî, dibe ku bi ser bikeve.



Digel wisa jî, ev şoreş dê nebûya şoreşeke sosyalîst, dê bibaya şoreşeke “komarî û civakî”. Arîstokrasiya feodal û xwecihî dê hatibaya rûxandin, ji bo her kesî dê mafê dengdanê hatibaya dayîn, gundî dê ji rewşa kirmanc(serf)bûnê hatibaya rihakirin û derbasî rewşa welatîyê azad bibaya û her wiha, dê demokrasiya birjûwa hatibaya binecîhkirin. Lê milkiyeta taybet, nakokiyên li navbera çînan û çewsandin dê berdewam kiribaya. Tenê li rex milkiyeta taybet milkiyeta giştî jî, li dûv giraniya beşdarbûna proleterya a di rêveberiyê de dê cih girtibaya.

Ango, proleterya di sererastkirina helberîn û aboriyê de dê xwedî gotinbaya. Çawaniya çînatî ya dewletê jî dê têkel bûya. Desthilat, dê bibaya desthilata hevpar ya karkeran, gundiyan û birjûwaziya-biçûkya radîkal.

Her wisa, berew “demokrasiya sosyalîst” dê mercên hewldaneke nuh hatibaya afirandin. Lê divêt nehête ji bîrkin ku birjûwaziya-biçûk ya demokratîk, li çolteran, piştî ladana milkiyeta feodal, li şûna wê, bi geşkirina helberîna kapîtalîsta biçûk (û milkiyeta wê), dê bixwesta serweriya xwe pêk bihêne. Ango, jibo rawestandina şoreşê “bi zûtirîn demê” dê bixebitiya. Divêt proleterya vê deliveyê nede. Divêt yekser partiyeke serbixwe birêxistin bixe û berdewamiya şoreşê mûkum bike.

“Demokratên birjûwa-biçûk.., gava dixwestin dawî li şoreşê bihênin, kêm-zêde hemî çînan dewlemend heta ji desthilatê nehêne dîrxistin, heta ku proleterya desthilata dewletê bi dest nexa, rêxistinên proleter, ne tenê li welatekî, li tevaya welatên diyar û berbiçav, di navbera proleterên van welatan de temet rawestandina mîlmilanê heta bi pêş nekeve û hêzên helberînê, qe nebe, hêzên di astê veguheztinê de nekevin nav destên proleteran, erkê me bînavê birr berdewamkirina şoreşê ye.” (Ji xîtaba Marks û Engels ya ji bo Lîga Kominîst bi riya komîteya navendî, veguhêz Stalîn, Prensîbên Lenînîzm, rûp: 38).

Teoriya şoreşa bînavê birr ya Marks û Engels ku piştî serdema emperlîzmê dê bibe teoriya şoreşa Marksîzmê ev bi xwe ye.

Heger em bala xwe bidnê, teoriya bînavê birr ya Marks û Engels, xwedî naveroka çar hêmanên bingehîn in:

1) Teoriya berdewam, derencama teoriyên qeyranên berdewamin. (Berdewam qeyran, ne qeyrana bêşikestine. Ev, şikestina carûbar qeyrana kujer ya kapîtalîzmê ye, lê nabe egerê nemana wê. Bi şeweyekî din, keftina kapîtalîzmê ya nav nivîna mirinê, carcaran derkeftina wê ya ji temara mirinê ye û bi ser xwe ve

hatine, lê derneketina ji nav nivînan e.)

2) Teoriya şoreşa berdewam, girêdayî biramana nêzîkbûna şoreşa Awrûpa ve ye.

3) Teoriya şoreşa berdewam, gundiyan ku heta bi wê hingê li ser arteşa birjûwazî dihatin heljimartin, girêdayî biramana pêkanîna arteşa proleterya ve ye. Ev teorî, komên berfireh yên gundiyan ne ji aliyê birjûwazî ve, ji aliyê proleterya ve arastekirina li dijberî feodalîzmê dihête pêşbînîkirin. Ango, teoriya şoreşa berdewam, potansiyela şoreşger ya gundiyan, ravekirina Marksîst e.

4) Teoriya şoreşa berdewam ya Marks û Engels, ji bo pêşrewîkirina şoreşa vemaî ya birjûwaziya Germeistanê ji aliyê proleterya ve û ev proleterya, bi alîkariya proleterya Awrûpa -bi taybetî proleterya Frensayê- bêrawestan, bi ramana arastebûna şoreşa sosyalîst ve girêdayîye.

Bi kurtayî, naveroka vê teoriyê, nirxandina durist ya potansiyela şoreşger ya cemawerên gundî, bi serperîştîya proleterayê arastekirina ber bi şoreşê ve ye.

Şoreşa berdewam ya Gottscalk û “Kominîstên pozbilind”yên li derdora wî jî, kêmdîtina potansiyela şoreşger ya cemawerên gundî, pûtepênkirina bi aborî û nîşanderiya -determinîzm-a civakî (Evana berevanî ji têperandina serdemeke mêjûyî dikirin) bingeh bû. (Ladana çep).

Di bingeha teoriya şoreşa berdewam ya Troçkî de jî, ev raman heye. Wekû di beşên pêş de emê bibînin, tevaya pasifîst û oportinîstên rastgîr ku ji karbidestîya raperînkariyê bêbehr in jî, her wekû bi proleterayê ve gelekî girêdayîne, kêmdîtina potansiyela şoreşger ya cemawerê gundî ji bo nixumandina bîrdoziya xwe ya pasifîst berdewam li qilifekî geriyane.

Wekû dihête dîtin, tevaya ladanên “rast” û “çep”, barekî giran ku bi tena serê xwe dê nikaribe helgire, li ser piştî proleterayê bar dikin û derbarî kêmdîtina şoreşgeriya gundiyan de hevber in. Aliyê hevpar yê ladanên “rast” û “çep” ev e. (Di dema şoreşa demokratîk a Rûsya, di 1905`an de, Troçkî`yê ku li gopîtka “çep” radiwestiya, di bingeha kakila Menşewîkiya wî de ev bi xwe bû.)

Ji ber ku ev teorî, piştî xwe dide teoriya qeyrana berdewam a kapîtalîzmê, wekû di destpêkê de me daxuyakirin, Marks û Engels, di pey vê çendê re dest ji vê teoriyê kêşabûn. (piştî 1850`yan)

Ew bi xwe, salên 1850`yan, salên pêşdebirina hêzên berhemhênana kapîtalîzmê,

bilezistina wan, di wateya birjûwa de -salên- hebûna jiyanêke xweş ya civakê bûn. (Wekû dihête zanîn, Kapîtalîzm, di serdema Emperyalîzmê de derbasî qeyrana berdewam bûye). Û pê baweranîna Mark û Engels ya bi qeyrana kapîtalîzmê ya “berdewam û dawî”, qeyrana aborî ya 1847`an, ne qeyrana dawî bû, ne jî qeyrana dawî ya kapîtalîzmê bû.

Marks û Engels, di payiza 1850`yan de hest bi şaşiya xwe kirin. (li beşê duyemîn binerîn) Û gotin; ev qeyran qeyraneke carûbar e. Hîna kapîtalîzm derbasî dema qeyranên berdewam û bînavbirr nebibû. Piştî van salên dawî Marks bi ser bûyera qeyranan de pûnijî. Û qeyranên carûbar yê kapîtalîzmê û bi şêweyekî berfireh qeyranên giştî yê sîstemê di Kapîtala xwe de lêkolîn kir. Marks naveroka ev qeyranên carûbar, bi “keftina jêr astê karê ya asayî ” nîşan dide, ev qeyranên carûbar bimêtina zêdebaryên berhemhênana zêde, sererastkirina aboriyê ji bingehe de, dermankirina pergale û piştî qeyrana her carûbarê jî, destpêkirina serdema geşedaneke nîvçe ya di rexnekirina siyaseta aborî de bi şêweyekî herî vekirî li ber çavan radixe. (Binerîn, Kapîtal. Cild. 5, rûp: 694-695).

Derencama van lêkolînan, ji ber rewşa geşedana kapîtalîzmê ya wê serdemê, Marks têdighê ku qeyraneke berdewam (ji bo wê demê) dê nebe mijara axaftinê, dev ji vê teoriya şoreşa berdewam berdide. Û ev teorî, wekû teoriyeke bi salên dirêj hatiye bicîhiştin û ji bîrbûyî li rexekî dimîne. Bi rastî heta bi serdema qeyranên (giştî) berdewam, ango heta kapîtalîzm bikeve qonaxa emperyalîzmê. Di teoriya şoreşa Marksîst ya di hundirê vê pêvajoyê de, berdewam giraniya rêveberiya civakî (determinist) û aborî diyar bû.

Lenîn di destpêka sedsala 20. de, di gorepana aborî û siyasî ya kapîtalîzmê de, bi destnîşankirina yasaya bi pêşneçûna di astê yeksane de -nîşana destpêkê ya vê yasayê gava Marks rexneya siyaseta aborî dikir, nadiyarên wî jî hene-, formulekirina teoriya emperyalîzmê ya ku qonaxa wê ya herî bilind e, destpêkirina serdema qeyranên dawî û berdewam yê kapîtalîzmê, bigotina Marks û Engels, êdî hatina “dema tekoşîna mezin ya çav li rê”, teoriya şoreşa proleteriyaya Rûsî ku teoriya şoreşa berdewam yan jî bînavbirr e, ragehand.

Partî û berdevkên Enternasyonalîsta duyemîn, bi taybetî jî şaxê Rûsya yê vê saziyê ku Menşewîk in, derbarî gotinên Marks û Engels yê hele ku peywend in bi bûyera şoreşa berdewam ve, mekanîk şirovekirin. Di bin ew mercên mêjûyî de -berî serdema pawanê- negengaziya qeyranên berdewam yê kapîtalîzmê, lewra jî nirxandinên Marks û Engels yê derbarî netêperbûna teoriyên şoreşa berdewam

de, di mercên dema emperyalîst de, bêyî heljimartina rastiya derbasbûna kapîtalîzmê ya serdema qeyranên berdewam, bi şêweyekî dogmatîk, her wekû di hemî helûmercan re derbas dibe, nirxandin. (Ev nirxandina pasîfîzm û oportunîzma rastgîr ku taybetmendiya wan ya ku nayê guhertin).

Evan kesan, raveyên heyber yên rewşên heyber li aliyekî danandine, pêşniyarên Marks û Engels yên ku ji bo hindêk welatên dîtir û hindêk mercên dîtirî mêjûyî pêşbînî dikirin, -derbarî destpêkirina şoreşê li welatê herî pêşkeftî yê kapîtalîzmê de û derbasbûna bi şêweyekî aştiyane jî dibe ku gengaz be- bi her çar destan xwe lê alandin. Her wiha kapîtalîzm, ne ew kapîtalîzma serdema Marks û Engels bû.

Kapîtalîzm, keftibû serdema şoreşên proleter û serdema qeyranên berdewam. Berî serdema pawanê, teoriya şoreşa berdewam ya ku Marks û Engels wekû nasaz amaje pê dikirin, di serdema qeyranên berdewam yên kapîtalîzmê de, dibû teoriya şoreşê ya Marksîzmê.

#### IV. TUNDIYA ŞOREŞGÊRANE Û DERBASBÛNA AŞTIYANE

Marks û Engels, bigotina Lenîn; bi bûyerên derbasbûna sosyalîzmê, ango, bi rûxsariya bûyeran ve xwe girênedabûn. Tenê wek yasaya giştî pêşbînî dikirin. Li dûv vê yasayê, ji bo proleterya bikare dîktatoriya birjûwa sernigûn bike, duçarî bikaranîna tundiyê, zordariyê ye. Zordarî, bigotina Marks; Hemşîreya her civaka kevn ku bi civaka nuh re avis e. Tenha rêyeke şoreşa civakî heye, li dûv nerîna Marks:

“... Lê, nebûna nakokiyên çînan û çînatî di yek pergalê de ye ku êdî werarên civakî, ji çarçoveya şoreşa siyasî dê derbikevin. Heta bi wê hingê, digel guherîna civakê ya ji hemî aliyan ve, di êvara sererastkirinê de, gotina dawî ya zanistiya civakî dê ev be: Yan tekoşîn yan mirin, yan cengeke xwînayî yan jî neman.” (Belengaziya Felsefê, rûp: 195).

Lê Marks û Engels, ji bo li hember pir-aliya jiyane nekevin dogmatîzmê, bi merc, sînordar, ango li cihên ku gengaz in, ji bo bizûtirîn û bi xwe bahwer gehiştina amancê bi ajîtasyonên aştiyane, derbarî derbasbûna aştiyane de jî axiftine.

Marks û Engels, “anîna sosyalîzmê bi rêkên aştiyane” ji bo Brîtanya û Amerîkayê ku ji parzemîna Awrûpayê gelekî cuda û her wisa xwedî taybetmendiyan cuda ne, wekû ihtîmalekê dîtine.

Li dûv nerîna Marks û Engels, ev welatan, xwedî taybetmendiyan bikarin derbasbûneke aştiyane pêk bihênin. Kapîtalîzm bi xwe ji parzemîna Awrûpayê bêhtir li van welatan şên bû. Proleterya li van welatan -li Brîtanya- piraniya serjimêriyê pêk dihanî û di sendîkayan de gelekî baş xwe birêxistin kiribû; û her wisa, di warê asta çandê de jî, ji proleterya li parzemîna Awrûpayê bilindtir bû. Çîna kapîtalîst, ji hevşêweyên xwe yê li Awrûpayê berjewendiya xwe çêtir dizanî û xwedî gerdişeke miyanrew bû. Digel van taybetmendiyan tevan, dewleta birjûwa ya li van welatan, ango brokrasî û arteş, li hemberî Parzemîna Awrûpayê sist û lawaztir bû.

Ji ber van egeran hemiyar, li Amerîka û Brîtanyaya ku xwedî van taybetmendiyan in, proleterya bi riya parlementoya birjûwa, ango, bi navgîniya mekanîzmaya dengdayînê, dikarî “bi riya kîrîna kapîtalîstan” bihata ser desthilatê.

Marks, di gotareke xwe ya ku di Nîsana 1851 de di New York Tribune de nivisiye wisa dibêje:

“Ji bo çîna karker ya Brîtanyayê, mafê bikaranîna dengdana giştî û ya siyasî her yek tişt in. Proleterya piraniya serjimêriyê pêk dihêne. Li Brîtanyayê, bidestxistina mafê dengdayîna giştî, li parzemîna Awrûpayê bêhtir ji her navgîniyeke ku wekû sosyalîst dihête binavkirin, pêşkeftineke hîna zêdetir, ango, dê pêşkeftineke ber bi sosyalîzmê ve pêk bihêne; derencama misoger ya bidestxistina mafê dengdayîna giştî dê bibe desthilatdariya siyasî a proleterya.”

## V. “NETEWATÎ” Û ENTERNASYONALÎZM

Berî derbasbûna vê bûyerê, em li ser nerînên Marks û Engels yê derbarî netewatî û enternasyonalîzmê de bi kurtayî rawestin.

Marks û Engels, gava raveya heyber ya rewşên heyber dîkin, ji aliyên giştî yê welatên kapîtalîst ve li şoreşa proleteryaê temaşe kiribûn. Marks û Engels, rizgariya proleteryaê û kedkarên cîhanê, berî her tiştî li Awrûpa û li Amerîkayê, bi hatina enternasyonalîzm -I. Enternasyonalîzm-a proleter bi desthilatê ve girêdidan. Ew, di nav sînorên netewî yê teng de, berdewam li dijî bendkirina tekoşîna şoreşê ya di çarçoveya netewî de derkeftine. Di baweriya wan de, amanca tekoşîna şoreşger ya proleteryaê, têperkirina sînorên ku birjûwazî danandiye û sererastkirina enternasyonalîzma netewan e; welatê proleteran tune, welatê wan enternasyonal e. (9\*)

“Çîna proleter, li hemî welatan li dijî bes yek û heman berjewendî; bes yek û heman dijmin, bes yek û heman cengê ne; piraniya proleteran tiştê sruştî ye ku hîn ji nihav de, ji nerînên peşînde xwe riha kiribin; tevaya bizavên wan, wekû bingeha mirovane û dijberî netewatî ne. Tenê yên proleter dikarin netewtiyê ji holê rabikin.” (Marks)

Lê ev, li her welatî, di çarçoveya ew sînoren proleterayê kudigel birjûwaziya xwe biceng e, divêt di wateya ku desthilata xwe ya netewî danamezrîne nehête şirovekirin. Tam berovacî vê yekê, çîna karker ya her welatî, wekû çîn, berî her tiştî, bi rengê ku dê li welatê xwe desthilatê bi dest bixe divêt xwe birêxistin bike, taktîkên xwe yên demkurt û demdirêj, aboriya welêt ku wekû zemîna tekoşînê herêkiriye, divêt pala xwe bide nirxandina rast ya rewş û mercan, mercên aborî û siyasî, ango, ravekirina durist ya avadaniya civakî.

Ji vî alî ve, tekoşîna çîna proleter ne ji aliyê naveroka xwe ve, ji aliyê rûxsarê xwe ve netewî ye.

Di bernameya Gothade ku di bin bandora Lassalle`îstan de hatiye nivîsîn, “Çîna karker, xebat û zîrekiya karkerên tevaya welatên pêşkeftî, derencama duçarî ya hevpar, digel ku dizane dê biratiya gelan ya nêvnetewî pêk were, ji bo rihabûna xwe pêşî di nav çarçoveya dewletê de dixebite”. Marks ev darijtina ku ji aliyê netewatiya teng ve hatiye zimên rexne dike û derbarî vê mijarê de wisa dibêje:

“Berovacî Rêbaza Kominîst û tevaya sosyalîzmên pêştir, Laselle, bizava karkeran ji aliyê netewatiya herî teng ve têgehiştîye. Di reşnivîsa bernameyê de, ev riya Lasalle dihête şopandin û ev, piştî çalakiya Enternasyonalê dihête pêkanîn! Xweş diyar dibe ku welat seranser şanogeha vê tekoşînê ye. Her wisa tekoşîna çîna karker bi vê wateyê dibe nîşana netewî, ne ji aliyê naverokê ve, lê wekû rêbaz - manîfesto- a kominîst jî dibêje; `ji aliyê rengdêriya xwe ve` netewî.” (Rexneya bernameya Gotha û Erfurt, rûp: 36) Marks û Engels têkiliyên “netewî” û enternasyonalîzmê aha bi vî rengî şirove dikin.

## **VI. ŞOREŞA PROLETERYA, LI WELATEKÎ YAN LI TEVAYA AWRÛPA?**

Di serdema berî pawanê de, pêşdeçûna nasaz ya kapîtalîzmê ku destnîşankirina wê hîna bi duristî ne gengaz bû, Marks û Engels; tenê li welatekî misogeriya serkeftina şoreşê ne gengaz e, her di piştî qeyraneke cîhanî de, rizgarbûna bi hev re ya proleteraya hemî welatên kapîtalîst, dibe ku bibe mijara axaftinê, gotibûn.

Marks di nav sînorên teng yê netewî de, negengaziya encamdayîna şoreşeke proleter wekû nimûne, têkçûna proleterya Frensî ya di Hîzerana 1849`an de nîşan dide:

“Di nav sînorên netewî yên Frensayê de, karkeran wisa bawer dikirin ku dê şoreşeke proleter bi ser bixin. Belê mercên berhemanînê yên Frensayê, bi bazerganiya xwe ya dereke, bi rewşa xwe ya di piyaseya cîhanî de û bi yasayên vê piyasê re hatine destnîşankirin. Frensa, ev çende hemiyar, bêyî tekoşîneke şoreşger ku tevaya Awrûpayê hembêz bike û li hember Brîtanya ku serdestî piyaseya cîhanî ye, dê çawa bikare ji hev parçe bike?” (Tekoşîna çînan li Frensayê, rûp: 48. Îtalîk yên me ne).

Marks, wekû dihête dîtin, di van salan de, xala destpêka şoreşa -şoreşa Awrûpa-cîhanê, Brîtanyayê dibîne. Li dût nerîna Marks, gehîştina çareseriyekê ji bo qeyrana siyasî ya ku li Frensayê heye û ji bo proleterya bibe desthilat, hebûna qeyraneke ku tevaya cîhanê bihejîne û di dema vê qeyranê de, rûdana şoreşeke proleter ya li Brîtanyayê merc dibîne:

“...Tekoşîna çînan ya di nav civaka Frensî de, bi beranberkirina hemî netewan wekû cengeke cîhanî dê berfireh bibe. Di tevaya cîhanê de gehîştina çareseriyekê, tenê raserî netewa ku serdestî bazara cîhanê ye, ango, raserî Brîtanyayê ye, ji ber derencama cengeke cîhanî, meriv dikare nêzî desthilatdariya proleterya bibe.” (Karl Marks, Tekoşînan çînatî yên li Frensayê, rûp: 132)

Di navbera salên 1847-50`yan de, ewên ku bawer dikirin dê li Parzemîna Awrûpayê şoreşên berdewam hebin, Marks û Engels, di teoriya şoreşê de, piştî helebûna xwe anîn zimên, wekû dihête dîtin ne ku karbidestiya raperînkariya di 1850`yan de, serdestiya abori û rêveberiya civakî bêhtir derdikeve pêş. Li dût nerîna wan şoreşa Awrûpayê, li welatê ku astê pêşdeçûna hêzên rencberiyê herî bilind e -mercên heyber yên herî stewiyayî- ji Brîtanyayê dê dest pê kiribaya.

Marks û Engels yên ku di sala 1850`yan de li Brîtanyayê niştecih dibin, demeke dirêj bi vî çavî li Brîtanyayê nerîn. (Wekû xala destpêkê ya şoreşa cîhanî dîtin). Belê piştî 1850`yan, bizava karker ya Brîtanyayê bilezûbez berew reformîzma birjûwa-biçûk, arasteyî çirrava trade-unionîst bû; û hêwaş hêwaş di navbera çîna karker û çîna karbidest de, komikek navencî ya zayîna arîstokrasiyê karker dest pê kir. Marks û Engels, bi dîtina tekoşîna çînatî ya vê Arîstokrasiyê û arastekirina vê tekoşînê li dût daxwaza kapîtalîzmê, baş nebaş ya bi şeweyekî serkeftî, ji

Brîtanyayê bêhêvî dibin û dîsa hemî balê dikşînin ser Parzemîna Awrûpayê.

Di bizava Komîna Parîsê de, piştî têkbirina karkerên Frensayê bi şeweyekî herî durindane, Marks û Engels, hemî hêviyên xwe bi tekoşîna li Germanîstanê ve girêdan. Û serkeftina çav li rê ya proleteriyaya li Germanîstanê, wekû destpêka şoreşa cîhanî nirxandin.

Bi kurtayî, li dût nerîna Marks û Engels ya ku şoreşa Awrûpayê hêviyek didîtin, li welatekî Awrûpî ku kê-m-zêde astê pêşdeçûnê lê bilind e, dê yekemîn şoreşa proleter ya serkeftî li dar bikeftaya. Ango, di teoriyên şoreşa Marks û Engels de, rêveberiya aborî û civakî bêhtir cih digre. Rola karbidestîya raperînkar hîna li paş e. Belê navenda şoreşê dê ji xorava -ji Brîtanya- bi şeweyekî yeksane hêwaş hêwaş ber bi rohilat ve her ku bişemite grîngiya nîvçe ya karbidestîya raperînkar jî zêde dibe. (Lê berdewam aliyê nîşander, aliyê rêveberiya aborî û civakî ye).

## **BEŞÊ DUYEM:**

### **SERDEMA EMPERYALÎST TEORIYA ŞOREŞÊ YA MARKSÎZM**

#### **I. VEGUHERÎNA KAPÎTALÎZMA MILMILANÊ YA SERBEST BEREW KAPÎTALÎZMA PAWANGER**

Ji cenga Frensa û Prûsyayê û bi dût wan de jî, ji bizava Komîna Parîsê heta bi destpêka sedsal a 20`an, kapîtalîzm kê-m zêde derbasî pêşdeçûneke aştiyane bû. Ji vê wardemê re, em dikarin wardema aştiyê jî bibêjin.

Ev wardem, wardemeke ku kapîtalîzmê hêzên berhemanîne bi pêş de xistiye, bilez xistin û di wateya birjûwa de jiyanê xweş pêk aniye, bi yek peyvê, werareke ku kapîtalîzm bi ser xwe ve hatiye. Belê, wekû her tiştê ku bi pêş dikeve, xurt dibe kapîtalîzm jî di vê pêvajoyê de, lawaziya xwe, pûçbûna xwe jî bi pêş xist û xurt kir. Bi gotinek din, kapîtalîzm ji aliyekî ve gava bilind dibû, li aliyekî din arasteyî genîbûnê, mijoxweriyê û pawangeriyê dibû.

Ev wardem, wardemeke ku kapîtalîzma takekesî bilez ji holê radike, serwerîbûna pawangeran, kartelan û trostan ya li ser aboriyê, serweriya sermiyan (kapîtal) a milmilanê ya serbest vedegerîne serweriya finans kapîtalê.

Lenîn, pêvajoya veguherîna kapîtalîzma milmilanê ya serbest berew kapîtalîzma



fînansê, li ser sê wardeman par vedike: (Lenîn vê pêvajoyê ji 1860`an dide destpêkirin).

“... Wardemên sereke yên di mêjûya pawanan de wisa dide xuyakirin:

1) Gehiştina xala herî bilind ya pêşdeçûna di mîlmilaneya serbest de, salên 1860-1880: Di vê wardemê de pawanên heyî her yek ji wan di rewşa dendikek biçûk temet ku nahêne dîtin de ne;

2) Salên ku wardema pêşdeçûna mezin ya kartelan û qeyranên 1873`yan dişopandin; belê evana hîna jî di rewşa awarteyan de ne; hîna rewşeke wan ya mûkum û bi biryar tune. Rewşeke demî nîşan didin;

3) Pêşdeçûna li dawîya sedsala 19`an û wardema krîza 1900-1903; di vê wardemê de kartelên heyî bi tevayî dibin parçeyek ji bingeha jiyana aborî, êdî kapîtalîzm veguherîye emperyalîzmê...” (Emperyalîzm, r: 29)

1857-60 piştî krîza aborî ya cîhanî, kapîtalîzm dikeve wardema xweşiyê (boom) ber bi çav. Geşedan û daneriyên di teknîk û zanistiyê de ku heta bi wê hingê nehatibûn dîtin, kapîtalîzm bilez derbasî pêvajoyê bilind û pêşveçûyîkirin. Kapîtalîzma ku daneriyên herî dawî yên teknîk û zanistiyê digel bikaranîna di pîşesaziyê debilez ew geşkirin, bi damûdezgehên berhemhênanê, bi çapeke berfireh ew bipêşxistin.

Berhemhênan wekû navend bilez berfireh bû. Her wiha bankên heyî, erkên xwe yên navgîniyê ku heta bi wê rojê dikirin danandin aliyekî, vêca ew bi xwe bûn dabînerên aboriyê û veguherîn pawangeriya herî mezin.

Destpêkirina serwerîbûna aborî ji layê trost û kartellan ve, bi taybetî jî, derencama desthavêjtina ji aliyê bankan ve, hewldanên biçûk û yên navîn bilez ji holê hatin pakijkirin. Bi navgîniya pergala Holdîngî, pawangerên mezin bûne takane serwerê aboriyê. Ê her wisa kapîtalîzm, derbasî serdemeke nuh, serdema fînans kapîtalê bû.

“Digel çirrbûna berhemhênanê, ji vêya jî zayîna pawangeran, pelçîmbûna bankan û telîhevbûna digel pîşesaziyê: Her wisa mêjûya pêkhatina sermayeya darayî û naveroka vê têgehê (Têgeha fînans kapîtalê) ye.” (Lenîn, Emperyalîzm, Qonaxa Herî Bilind Ya Kapîtalîzmê, r: 60)

Ê derencama sruştî ya vê pêşdeçûnê, nadiyarbûna di wardema dijberiya serbest

de pêşdeçûna leng û neyeksaneyê kapîtalîzmê, bi hemî tazîbûna xwe ve derkeftina wê ya holê, diyarbûna wê ya berbiçav e.

“Hebûna welatên cudaû hewldankaran, şaxên Pîşesazî di nav pêşdeçûnên leng û ne wek hev de, di rejîma kapîtalîst de rûdaneke misoger e.” (Berhema navbûrî, r: 77) Ev pêşdeçûna ne wek hev, digel pawangeran di aboriyê de sermîyan(kapîtal)ek gelekî mezin afirand. Kapîtalîzmê, ji ber ku bi şêweyekî goncayî, Pîşesaziyê çandinî bi pêş nexist û her wisa li dûv karê helberînê - Birsîbûna cemawer û ji ber zêdebûna hejariyê ya bilez- berdewam kêmaniyêke rencderiyê diafirand, ev zêdeyî ji neçarî, arasteyî welatên mêtîngeh bû. Siyaseta Mêtîngehiya berê ku pişt bi hinardekirina tiştan ve girê dida, cihê xwe, ji mêtîngeriya emperyalîst ku pişt xwe bi hinardekirina sermayê ve girêdida, hişt. Cîhan, ji aliyê mistek pawangeran ve hat parvekirin:

“Welatên ku sermaye hinarde dikirin, bi wateya mecaziya peyvê, di navbera xwe de cîhan dabeş kiribûn. Lê sermayeya darayî yekser rê li ber dabeşkirina goka dinyayê vedike.” (berhema navbûrî, r: 83) Û tevaya welatên cîhanê “karvedanên sermayeya darayî ya cîhanî, xelekên zincîrê pêk dihênin.”

Di van rûdanan hemîyan de, afirandin û nûjeniyên di zanistî û teknîkê de ku heta bi wê demê nehatibûn dîtin (10\*)ji bo ladana cudahiyên yeksaneyê li navbera welatên kapîtalîst,rewşeke goncayî amade dikir. Di nav vê rewşê de, welatekî dîtirî kapîlasît yê hîn paşdemayîtir, bi pêşdeçûneke nagehan xwe digehîne welatekî pêşdeçûyî û li dûv yeksaneyê hêzên taze yê cîhana dabeşbûyî, dabeşkirina “bêhtir dadwerane” daxwaz dikir. Ev yek, ser ji nuh de, di navbera kapîtalîstan de vekirina riya cenga parvekirinê misoger dikir.

Di qonaxa emperyalîst de, pêşdeçûna leng û kulek ya kapîtalîzmê, aloziyên di navbera pawangeran de kûrtir û tundtir dikir. Derencama sruştî ya vê çendê, di eniya emperyalîst de vebûna qelşan û di vebûna van qelşan de, gengaziya serkeftina sosyalîzmê heye.

“Çima emperyalîzm dibe kapîtalîzma cankêş, têgehiştina derwazebûna wê ya ji bo sosyalîzmê asantir dibe; Pawana ku ji kapîtalîzmê dizê û bi pêş dikeve, êdî mirina kapîtalîzmê ye. Û destpêka derbasbûna wê ya sosyalîzmê ye.” (Lenîn)

Û êdî wardemeke mêjûyî li paş dima. Mêjûyê rûpelekî xwe yê nuh disûrand. Sernivîsa ev rûpelê taze, serdema şoreşên proleter e. wardema “aştiyê” êdî li paş dima. Êdî wardema şoreşgerên proleter, ji şirovekirina cîhanê derbasbûna

guhertinê, serûbinbûna her tiştî, destpêkirina rûdanên berdewam û aloziyên giştî yên kapîtalîzmê dest pê dikir.

“Ew gava çav li rê” ya ku di wardema 1840-50`yan de, Marks û Engels pêşbînî dikirin, êdî hatibû.

## II. TÊKDANA “ORTODOKS” YA MARKSÎZM Û TEORIYA ŞOREŞÊ YA LENÎNÎST(I)

Rêxistina Enternasyonal ya li dawîya vê wardema veguherîna mîlmîlanê ya ji bo pawanê, duyemîn Enternasyonal e. Di wateya birjûwa de, pêkanîna xweşiyê ji aliyê kapîtalîzmê ve, di vê wardema “aştiyê” de, partiyên duyemîn Enternasyonala li Awrûpayê, bi riya parlementeriyê serkeftinên mezin bi dest xistin. Bi taybetî partiya karkeran ya li Germenîstanê, serkeftinên mezin yên helbijartinê bi dest xistin. (Li gelek deverên helbijartinê bêhtir ji %50 yê dangan wergirt.)

Ev wardem, wekû li hemî wardemên aştiyê dibe, wardemeke ji bo geşedana layenên rastgîr û layenê pasîfîst a çepgîr e. Bidestxistina serkeftinên parlementer, serî li tevaya partiyên duyemîn Enternasyonalîstê gerand. Wisa zanîn ku ev wardem dê her wisa bidome, bi amadekariyên wardema cengê hîç danekeftin.

Stalîn, pasîfîzma duyemîn Enternasyonalê wisa şirove dike:

“Ev wardem, wardema pêşdeçûneke hinekî bêdeng ya kapîtalîzmê, nakokiyên wêranker yên emperyalîzmê ku hîna ji bo diyarbûnê derfet nedîtiye; grewa aborî ya karker û sendîkayên wan ku kêr zêde bi şêweyekî `asayî` bi pêş dikevin, bidestxistina serkeftinên `berbiçav` yên komînan, tekoşîna helbijartinê û parlemetoyê, bi pesindayînen şêweyên tekoşîna legal firandina wê ber bi asmanan ve û baweriya bitêkbirina kapîtalîzmê bi riya legalîteyê, wardemek ji şêweyên berî cengê bû. Bi yek peyvê ev wardem, wardemek bû ku nedixwestin bi şêweyekî ciddî ramana rahênana şoreşgerane ya cemawer bikin.” (Prensîbên Lenînîzmê, r: 17)

Di salên xwe yên dawî de Engels vê bûçûna ne li bar dibîne, di mijara reformîzma duyemîn Enternasyonalê de, xwest Wilhelm Liebknecht û Kautskî hişyar bike. Engels, di sala 1891`ê, di rexnekirina bernameya Erfurt de, derbarî vê `derbasbûna aştiyane` de nîgaşên pasîfîst û parlementer bi zimanekî sert rexne kir.

Belê hemî rexne û hişyarkirinên Engels bê encam man: Partiyên duyemîn

Enternasyonalîstê, di çirrava parlementerîzmê de wiha baş çikiyane. Belê di salên 1900`an, di destpêka şoreşên proleter de, rewşa çepgeriya Awrûpayê wisa bû.

Partiyên II. Enternasyonalê, di wardema ku kapîtalîzmê pêşdeçûn û geşedaneke aştîyane nîşan da, bi serxweşiya serkeftinê helbijartinê ku bi dest keftine, evê wardema kapîtalîzmê ya nuh, hîç, belê hîç tenegehiştin. Ev “wardema aştîyê” ku wardemeke demî ye, wisa dizanîn ku wê bidome.

Ev partiyanan, ravekirinê heyber ya rewşên heyberdanandine aliyekî, bêyî bihête bîra wan ku Marksîzm rêhbereke çalakiyan e û bi mêjûyê re digel berfirehbûnê zengîn dibe û wardema berî pawanê Marks û Engels wekû dogma dîtine. Bi ser de jî, gotinê Marks û Engels yê derbarî mercên awarte de jî berfirehkirinê bi duristî keftin nav dogmatîzmekê.

Ji aliyê “Ortodoksî” ve parastina pêşniyarên Marks û Engels yê wardema berî pawanê, ango cemidandina wê bi rewşa wan î heyber re digonciya. Û ev dogmatizm, her wisa ji bo xiyamet û tirsonekiya wan dibû rûbendek. Derbarî wardema bilindbûna hêzên rencberiyê ku taze bi pêş de diçin û berovacî wan nakeve, “derbarî wardema werarê de”, teoriya şoreşê ya ku Marks û Engels pêşbînî dikirin, dixwestin taktîk û şeweyên xebata wê, wardema qeyranê gîştî yê kapîtalîzmê û bi wardema şoreşên sosyalîst re bigoncînin.

Marks û Engels, ma negotibûn tenê li welatekî, di nav tixûbên netewî yê teng de şoreşeke proleter bi ser nakeve?

Şoreş, li dûv pêşniyarên Marks û Engels, li welatên kapîtalîst yê bi pêş de çûyî, wekû “hevdem”, bi şeweyê şoreşa cîhanî ma dê rû nedabaya?

Şoreşa destpêkê ya proleteriyê, li welatê ku hêzên rencberiyê herî bi pêş de, xwedî mercên heyber yê herî li bar, astê demokrasî û çanda proleter li wê herî bilind e, ma dê dest pê nekiribaya?

Ji ber vê çendê, hewldana her raperînkariyekê li welatekî ku astê pêşdeçûna hêzên rencberiyê nizm e, her wekû têkçûna Hezîrana 1849`an, her wekû têkçûna Komîna Parîsê, duçarî encamdana têkçûnê bû. Her wisa, bendewariya stewîna hêzên rencberiyê merc bû.

Wekî din jî, nerînê Marks û Engels yê ku ji bomercên dîtirî mêjûyî dabûn pêş, dogmatîzekirina wan ji aliyê van partiyan ve li aliyekî, pêşdîtinê wan yê ji bo

rewşên “awarte” jî berfireh dikirin. Ji ber kuli Brîtanyayê proleterya piraniya serjimêrê pêk dihêne, derbarî hebûna gengaziyê ya serkeftina şoreşa proleter de bi riyên aştiyane, bi gelemperîkirina sîncordariya bi merc ya Marks, ji bo proleterya bikare şoreşê bike, piraniya serjimêrê ya proleterayê wekû merc didan pêş. Li dût nerîna wan proleterya dê piraniya serjimêrê pêk bihêne û bi wergirtina piraniya dengên dê bibaya desthilat. Partiyên II. Enternasyonalîstê di serdema şoreşên proleter de, aha bi vî rengî Marks û Engels şirove dikirin.

Pasîfîstên II. Enternasyonalê, gava Marksîzm bi vî rengî dogmatize dikirin, bi herêkirina Marksîzmê wekû rêhberê çalakiyan Lenîn, rewşên heyber bi ravekirinên heyber, pêvajoya veguherîna kapîtalîzmê berew emperyalîzmê ji nêz de dişopand.

(Lenîn, pertûka xwe ya bi navê Emperyalîzm: Qonaxa Herî Bilind ya Kapîtalîzmê, di sala 1916`an de nivîsiye; lê ev hemî ravekirinên ku Lenîn ji sala 1900`an kiriye, bi ravekirina yekser ya nakokiyên wardema emperyalîst ve girêdayiye.)

Li dût nerîna Lenîn, wardem ne wardema Marks û Engels bû;

Kapîtalîzm derbasî qonaxeke din bibû. Li dût pêşbîniya Marks û Engels, di navbera salên 1947-50`an de derbasbûna kapîtalîzmê ya wardema qeyranên giştî û berdewam, êdî derbasî pêvajoya cankêşanê bûye. Û, Lenîndi wardema pawangeriyê de, geşedana bi diyarbûneke berbiçav ya kapîtalîzma leng û bê aheng durist dibîne û ji vê yekê jî, derencama hebûna gengaziya serkeftina sosyalîzmê ya li welatekî derxist:

“... Pêşdeçûna kapîtalîzmê li welatên ji hev cuda, bi şeweyekî dût ji pergalê bi rê ve diçe. Di pergala berhemhênana sermayê de bi şeweyekî din jî nabe. Ji vê yekê jî, bêyî redkirinê ev diyar dibe ku sosyalîzm li hemî welatan di yek demê de bi ser nakeve. Pêşî li welatekî yan li çend welatan dê bigehê serkeftinê, yê dîtir jî, yan di wardema birjûwa, yan jî berî wardema birjûwa de dê bimînin.” (Bernameya Cengê ya Şoreşa Proleterya, Ceng û Sosyalîzm, r: 61)

Lenîn, “Nebûna astê wekheviya geşedana aborî û siyasî, yasaya misoger ya kapîtalîzmê ye. Pêşî li gelek welatên kapîtalîst, heta li welatekî jî derencama hatina sosyalîzmê ji vê çendê derdikeve” dibêje. Pêşniyara Marks û Engels ya bi şeweyê “Şoreş nagehan li hemî welatan dê were destpêkirin” dide xuyakirin ku wardema emperyalîst kevn bûye.

Li dûv nerîna Lenîn, dogmatîzekirin û dubarekirina ev pêşniyara kevnbûyî ya Marks û Engelsji aliyê partî û berdevkên duyemîn Enternasyonalîstê ve, ji bilî xizmetkirina ji birjûwazî re tiştêkî din nakin:

“Hemî şêweyên ew kesên ku xwe gelekî bîrewer dizanin û bi ser de jî xwe sosyalîst dibînin û dakokiyê dikin ku heta şoreş li hemî welatan dest pê neke, bi tekoşînê desthilat bi dest nahê, em xweş dizanin. Evan kesan, hest nakin ku bi van laqirdiyan piştî xwe dane şoreşê û li rex birjûwazî cih girtine. Di astê nêvnetewî de, bendewariya pêkanîna şoreşê ji aliyê çînên xebatkar ve, dihête wateya ku her tişt di bendewariyê de cemidiye. Ev lewçetî ye.” (Biner Çapa 4., Berg: 27, r:336, Stalîn, veguheztina ji Lenîn: Ladanên rast û çep, r: 220)

Li dûv Lenînîzmê, nerîna li şoreşa proleter wekû bûyereke navxweyî ya wî welatî, lêkolînkirina têrêkirin û netêrêkirina geşedanên hêzên berhemhênanê êdî li paş maye. Di wardema emperyalîst de, mercên şoreşê li her welatekî bi astê pêşdeçûna hêzên berhemhênanê ve ne girêdayiye. Ji ber ku birûxandina otarşiya aborî ya emperyalîst, aboriyên taybet yê xomalî, veguherandiye xelekên zincîreke ku jê re aboriya cîhanî dihête gotin. Ê jî hemî aliyên pergale ve, li tevaya welatan mercên şoreşê yê heyber hene.

Ji ber vê çendê, li welatekî herî pêşdeçûyî yê kapîtalîst, li welatê ku astê çand û demokrasiyê lê herî bilind ebendewariya yekem şoreşa proleter şaş e. Ev pêşniyara Marks û Engels ya ku ji bo berî wardema pawangeriyêrast e, di wardema emperyalîst de êdî kevn bûye. Ê li dûv Lenînîzmê yekem şoreşa proleter ne li vî yan li wî welatê ku kapîtalîzm, demokrasî lê herî bi pêş de çûye, li welatê ku zincîra emperyalîzmê lê herî lawaz e dê pêk were:

“Li cihê ku zencîra emperyalîst lê herî lawaz e, dê eniya sermayê bihête qelaştin; çikû şoreşa proleterya, derencama şikestina zencîra emperyalîst a cîhanî ye û welatê ku şoreş destpê kiriye, welatê ku eniya sermayê qelaştiye, di wateya kapîtalîst de, li hemberwelatên ku bêhtir bi pêş de çûyiye, kêmtir bi pêş de çûye, digel vê yekê di çarçoveya kapîtalîzmê de gengaz e.” (Stalîn: Prensîbên Lenînîzm, r: 32)

Teoriya “têperbûna aştîyane” jîku partiyên II. Enternasyonalê didane pêş, di nerîna Lenîn de şaş e. Ji ber ku kapîtalîzm keftiye wardema cankêşanê, Brokrasî û Arteşa xwe baş bi hêz xistiye. Di wardema Emperyalîst de, tenha rêyek li pêşberî şoreşa civakî heye, ew jî; “bi riya tundiyê parçekirina makîneya brokratîk

û ya leşkerî"ye.

Teza Marks û Engels ya berî wardema pawangeriyê ku ji bo Brîtanya û Amerîkayê pêşbînî dikir, di wardema pawangeriyê de kevn bûye, natêper e.

Di vê mijarê de Lenîn dibêje:

"Îro.., ev sînordarkirina Marks natêper e. Wekû Amerîkayê Brîtanya jî, azadiya Anglo-Sakson (milîtarîzm û brokratîzm) di dinyayê de nûnerên herî mezin û herî dawî jî, yên ku her tişt bi xwe ve girêdan û her tişttevlî damûdezgehên xwe yên leşkerî û brokratîk, serûbin noqî çirrava Awrûpaya ku mişt e ji xwîn û krêtiyê, bûn.

Niha, wekû li Amerîkayê dibe, li Brîtanya jî, `yekemîn mercê şoreşa durist ya hemî gelan` (...) şikandin û parçekirina `makîneya dewletê ya berhev` e." (Dewlet û Raperîn, r:52)

Di teoriya şoreşa Lenînîst de, li welatekî ku çîna karker lawaz be û piraniya serjimêrê ji gundiyan pêk hatibe, parçekirina zencîra emperyalîst gengaz e. Li vêrê hebûna şiyana gundiyan û tevgerxistina vê şiyanêdi rêveberiya proleterya û partiya wê dewekû bingeh dihête herêkirin:

"..., Wekû dihête zanîn, Lenîn, derbarî nerîna proleter a li hember gunditiyê, Marks agahiyên xwe berhev kiribûn û bi pêş de biribûn." G. Dimitrov, Dewreyên Sereke di Pêşdeçûna Partiyê de, Ber Bi Komara Gel ve, r: 124)

Di teoriya şoreşê ya Lenîn de, rola însiyatîfa raperînkar (ji ber taybetmendiyên wardema emperyalîst), ji teoriya Marks û Engels bi gelekî girantir e. Di wardema emperyalîst de, ji ber ku bingeha şênber ya şoreşan amade ye, ravekirina bûyerê li ser gavhavêjtina di demeke goncayî de ya însiyatîfa raperînkar dimîne.

Di teoriya şoreşa sosyalîzma zanistî de, her ku rola gundiyan zêde dibe, her ku gorepana şoreşê berew rohilat dişemite, aliyê Vîndar (volantirîst) derdikeve pêş.

Ji ber ku niyaza li darxistina şoreşê ya partiyên II. Enternasyonalîstê tune ye, derdekî wan wekûbirêvebirina şiyana raperînkar ya gundiyan, qezenckirina wan ya ji bo rêzên proleterayê tunebû. Ewan şoreş, (bi hêviya) proleterbûna piraniya gundiyan, pêkanîna gundiyan ya piraniya serjimêriya proleterayê, ji bo demeke nadiyar bi paş xistibûn. Li dûv ramana "Ortodoks"ya duyemîn Enternasyonalê, divêt gundî bigiştî di nav arteşa birjûwazî de bihêne dîtin. Li dûv vê ramanê,

“gundi bigiştî tenê xebatkarên berhemhênanê ne” û berjewendiya wan li dijî proleterya ye. Ev, têgehiştina oportunîzma II. Enternasyonala bi şêweyê dijberkirina civakê li ser du rengan, ji bilî têgehiştina “Ortodoks” ya kevnare ne tiştêkî din e.

Pasîfîstên II. Enternasyonalê, wekû li silal bi kurtayî me dane xuyakirin, hemî tezên xwe yên oportunist bi Marks û Engels ve girêdidan. Di Marksîzmê de ya misoger çi ye, ew hergîz tenegehiştibûn. Bigotîna Stalîn, bidanîna aliyekî ya kakila Marksîzmê, wan -ravekirina heyber ya rewşên heyber- Marksîzm dicemidandin.

Di salên pêşî yên wardema emperyalîst de, tenê bigotinên Lenîn û Bolşewîkan kakila Marksîzmê ji hev cuda dikirin, biparaztina naveroka Marksîzmê, li hemberî rastiya nuh ya jiyane digel mûkumkirinê zengîn dikirin.

Di salên 1900 de Lenîn dibêje:

“Em teoriyên Marks wekû temambûyî, gelemperiyê naguher nabînin. Berovacî vê yekê em diramin ku vê teoriyê tenê hîmên zanistiyê li cih danandiye; heger sosyalîst naxwazin li dût jiyane bimînin, divêt vê zanistiyê ji hemî aliyan ve mûkum bikin. Li dût têgehiştina me ji bo sosyalîstên Êris, di cihê xwe de bikaranîna teoriya Marks ya serbixwe -bi taybetî- pêdivî ye.”

### **III. ŞÊLÛKIRINA “ORTODOKS” YA MARKSÎZMÊ Û TEORIYA ŞOREŞÊ YA LENÎN (II)**

#### **TEORIYA ŞOREŞA BÊNAVEBIRR YA LENÎNÎST Û MENŞEWÎZM**

Di destpêka sedsala 20. de, li dût çavdêriya Lenîn ku veguherîna kapîtalîzmê berew emperyalîzmê, di navbera salên 1847-50` de, pêşbîniya Marks ya hatina demê, “dema tekoşîna mezin” êdî hatibû. Êdî “cenga di navbera birjûwazî û proleterya de, li tevaya Avrûpayê di rojevê de ye”. Û teoriya şoreşa berdewam ya ku Marks û Engels ji bo Germenîstana 1850`yî pêşbînî dikirin, Lenîn, wekû teoriya şoreşa proleterya a Rûsyayê radigehand.

Di navbera wardema salên 1840-50`an de, Marks û Engels, di vê teoriya şoreşê de bi rastî jî hele bibûn. Ji ber ku wan, pêşbînî dikirin ku di 1847`an de, digel qeyranên bazerganiya cîhanî, kapîtalîzm derbasî wardema qeyranên giştî û berdewam bûye. Belê di wê demê de, kapîtalîzm di wardema xwe ya bilindbûnê de bû. Lewra, li darkeftina şoreşêke proleter ya li Avrûpayê bêgengaz bû. Ji ber vê



çendê, heger li Germenîstanê proleterya serperîştîya şoreşa demokratîk bike jî, li Awrûpayê, ji ber nebûna şoreşên proleterya yên ku hevdem dê li dar bikevin, proleterya nedikarî berdewamiya şoreşê misoger bike.

Li Germenîstanê ji bo proleterya ji qonaxa demokratîk ya birjûwa bêrawestan derbasî qonaxa şoreşa sosyalîst bibe, alîkariya proleterya serkeftî ku li gelek welatên Awrûpayê desthilatdarî bi dest xistiye, merc bû.

Lê, aniha (di wardema emperyalîst de) kapîtalîzm keftîye wardema qeyranên berdewam. Ji bo hatina proleterya Awrûpabo desthilatê, mercên heyber yên sîstemê bi giştî stewiyane. Ji ber vê çendê, ev teoriya şoreşa ku Marks û Engels piştî salên 1856`an dev jê berdane, di wardema qeyranên giştî û berdewam yên kapîtalîzmê de, teoriya şoreşa durist û takane ya proleterya welatekî mîna Rûsyayê ku li ber derwazeya şoreşa demokratîk ya birjûwaziya derengmayî ye.

Ango, li dûv nerîna Lenîn, ew salên (salên 1840-50) ku Marks û Engels bendewariya şoreşeke Awrûpî dikirin, wekû rewşa Germenîstanê di sedsala 20. an de, rewşa Rûsyaya Qeyser (Çarr) jî wisa bû. Derbarî vê wekhevîyê de Stalîn dibêje: "Tiştê ku hat serê Lenîn û Rûsyayê, di navbera salên 1840-50`an de hatiye serê Almanya, Marks û Engels." (Prensîbên Lenînîzmê, r: 15)

Stalîn dîsa balê dikêşe sergotina şoreşa demokratîk ya birjûwa ku li Germenîstana di manifesto de dê bibe destpêka şoreşa proleterya, wiha dibêje:

"Ji bo Rûsyaya destpêka sedsala 20`an, divêt her van tiştana bihêne gotin; lê astê pêşdeçûnê li Rûsyayê, ji Germenîstana 1840-50`an di xaleke hêj bilindtir de bû. Diviyabû Rûsya, di nav çarçoveya Awrûpayeke pêşkeftî de û (Frensa û Brîtanya li aliyekî) bi proleterya yeke ji ya Almanyayê hêj bipêşdetir ev şoreş li dar bixistaya; û her tiştî dida xuyakirin ku ev şoreş, dê bibaya havên û destpêka şoreşa proleterya.

Hîna di sala 1902`an de, hîna di rojên amadekirina şoreşa Rûsyayê de, di berhema Lenîn ya bi navê Em Çi Bikin? de, ev gotinên wî yên ku paşeroj didîtin, ne helkeftinek bû. `Mêjûyê, li her welatekî ku proleterya wê tûşî pêdiviya cîbecîkirina erkan e, di gavê de, yekser me rûbirûyî (wate Marksîstên Rûsyayê, J. Stalîn) bi erkekî lezgîn yê herî şoreşgêrane kiriye. Cîbecîkirina vî erkî, ne bes paşverûtiya Awrûpayê, rûxîna kelha herî xurt ya paşverûtiya Asyayê jî, dê proleterya Rûsyayê bigehîne rewşa serperîştîya proleterya şoreşger ya nêvnetewî.` (c: IV, r: 382) (Prensîbên Lenînîzmê, r: 15-16)

Sedemê hatina proleteriyaya Rûsî bo rewşa serperîştîya proleteriyaya şoreşger ya nêvnetewî, komkirina hemî nakokiyên di sînga xwe de ya Rûsyaya Çarr ku gehîştîye sînore xwe yê herî dawî, bi pêgotiyek din, divêt xelesa herî lawaz ya zencîra emperyalîzmê be:

“Aha ji ber vê çendê, derencama nakokiyên emperyalîzmê, diviyabû Rûsya bibaya mijara pevçûnan; ev, tenê ev nakokiyên, ne ji ber diyardeya bi taybetî xweranegirtinê ya riswatiya li Rûsyayê; ne tenê ji ber ku Rûsya sermayeya darayî ya Xorava bi pêkanîna desteka sereke ya bi emperyalîzma Xorava re ku bi mêtîngehên rohilat ve girêdide; belê digel van sedeman, ji ber ku hêzeke durist xwedî çareserkirina nakokiyên emperyalîzmê tenê li Rûsyayê heye.

Lewra, şoreşa li Rûsyayê diviyabû şoreşeke proleter baya (11\*) û diviyabû ji roja xwe a yekemde ev şoreş bi pêş ve biçûya, durvê xwe yê nêvnetewî wergirtiba û wekû derencam, diviyabû emperyalîzmê ji bingehe de bilerizandaya.” (Stalîn, Prensîbên Lenînîzmê, r:14)

Derencama sruştî ya vê nirxandinê, proleteriyaya Rûsyayê di hundirê pêvajoyekê de dê du cengên ji hev cuda bi rê ve biribaya:

“Cenga li navbera birjûwazî û proleteriyayê, li tevaya Awrûpayê di rojevê de ye. Ev ceng ji mêj de gehîştîye Rûsyayê jî. Li Rûsyaya hevçerx, ne du hêzên ku rewşa cengê naveroka şoreşê diyar dikin, belê du cengên civakî heterojen û ji hev cuda ne. Cenga yekemîn, pêdiviyê di sînga pergala otokratîk ya îroyîn de bihête dayîn û bi ser kolewariyê ve ye; lê ya din, ya ku li ber çavên me peyda dibe, cenga ku di nav pergala demokratîk a birjûwaziya dahatû de cih digre. Yek ji bo azadiyê (ji bo azadiya civaka birjûwa), ji bo demokrasîyê, ango ji bo desthilatdariya misoger ya gel cenga ku tevaya gel pê radibe; ya dîtir jî, ji bo rêxistinbûna sosyalîst ya civakê tekoşîna çînatî yeku li dijî birjûwazî proleterya pê radibe.

Her wisa, ji aliyê hevqirtina hêzên civakê ve, bi durvê xwe, bi amancên xwe û di şer de hinermend û xwedî biryar, erkekî giran û sext mîna birêvebirina di heman demê de du cengên bi tevayî ji hev cuda dikeve ser şanên sosyalîstan.” (Lenîn, Sosyalîzm û Gundî, Peymana Karker-Gundiyan, r: 15) (12\*)

Di êvara şoreşa birjûwa ya Rûsî ya di 1905`an de, perspektîfa şoreşa Bolşewîk, aha ev bi xwe bû. (13\*)

Em dikarin taybetmendiyên cuda yên vê perspektîfê bi vî rengî darêjin:

1) Teoriya şoreşa bêtevber ya Lenînîst, teoriya şoreşa dema cankêşana kapîtalîzmê ye. Ev teorî, ne bes ji bo Rûsyaya Qeyser ku di destpêka qeyrana giştî ya kapîtalîzmê de ye, ji bo tevaya welatên emperyalîst kapîtalîst ku nekarîne derbasî pêvajoya pêşkeftinê bibin, lewra, ji bo welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngehan jî derbas dibe.

2) Teoriya şoreşa berdewam ya Lenînîst, ji teoriya şoreşa berdewam ya Marks hîna bipêşdetir, arastekirina potansiyela şoreşgerî ya gundiyan ber bi şoreşê ve ye. Li dûv vê teoriyê, di dema emperyalîst de, proleterya dikare femandariya arteşa gundî bike. Û erkê proleterya ku dixwaze bêtevber şoreşê bi ser bixe, divêt femandariya vê arteşê jî bike.

3) Li welatekî mîna Rûsyaya Qeyser, ji bo veguherandina şoreşa demokratîk ya birjûwa bo şoreşa sosyalîst, alîkariya proleterya Awrûpa ya desthilatdar merc e.

Perspektîfa şoreşa koma Menşewîk ya Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsyayê ku milekî duyemîn Enternasyonalîstê ye, wekû derencameke sruştî ya têgehiştina şoreşa fermîa duyemîn Enternasyonalîstê, bi temamî berovacî perspektîfa Bolşewîk bû.

Li dûv têgehîna “Ortodoks” ya duyemîn Enternasyonalîstê, yekemîn şoreşa proleterya li welatekî ku kapîtalîzm û demokrasî bi pêş de çûye û piraniya serjimêrê proleterya pêk dihêne, dê rû bidaya. Û ev şoreşa ku li vî welatî rû bidaya jî, dê derbasî welatên dîtir bibaya. Her wisa şoreşa cîhanê dê hevdembaya.

Li dûv Menşewîzma ku bi vêramanê tevdigere, ji ber ku di salên 1900`an de mercên heyber yê rûdana şoreşeke proleter ya cîhanî ne stewiyane û her wiha, piştî bidestxistina desthilatê ji aliyê proleterya ve, ji ber bi duristî pêknehatina kadroyên rêveber yê pêdivî, serperîştîya proleterya ya ji bo şoreşa li Rûsyayê nedihat ramankirin. Di pêvajoya heta bistewîna van mercan divêt birjûwaziya Lîberal ya Rûsî, şoreşa birjûwa pêk werîne, proleterya jî jê re bibe destek. Heta ew kêliya çav li rê bihatana, Proleterya Rûsî “di rewşeke demokratîk ya bi şeweyê Xorava”, bi azîna tekoşîna parlementer dê bi hêzkeftibaya (xurt bibûna).

Teoriya şoreşa berdewam ya Bolşewîkan, teoriyeke berelayî û anarşîst e. Ev teorî berdewamiya heleyên Marks û Engels yê di navbera salên 1840-50`an de ye. Marks û Engels piştî bi demekê helebûna di vê mijarê de dev jê berdana xwe ya ji vê teoriyê, ma ne anîn zimên? Û Marks di sala 1859`an de, di pêşgotina xwe ya di beşdariya rexnekirina siyaseta aboriyê de, digel danasîna şoreşê, ma ev teorî

gunehkar nedikir?

Proleterya tenê dikare bi şoreşekê dabikeve; ew jî, şoreşa sosyalîst ya wî bi xwe ye.

Ji ber vê çendê, bipêkanîna şoreşa xwe birjûwazî,merc e ku berhemhênanana xwe ya kapîtalîst bi pêş xistibe. Bêyî stewîna hêzên berhemhênanê, bêyî pêkanîna piraniya serjimêriyê ya proleterayê, bêyî bicihbûna pergala û civaka birjûwa ya li Rûsyayê, tiştek bi navê desthilata proletereyê nabe mijara axaftinê.

Teoriya şoreşê ya ku Menşawîzm ji bo proleteraya Rûsî pêşbînî dike jî ev e.

Her du teorî, -wekû di beşê dihêt de emê li ser rawestîna -bûne bingeha şeweyê xebat û têgehîna partiyê a Bolşewîk û Menşewîkan. Yên ku cîhanê ji hev cuda şirove dikin, navgînên wan yê guhertinê jî helbet dê ji hev cudabin!

#### IV. TÊGEHÎNA PARTIYÊ YA BOLŞEWÎKAN Û MENŞEWÎKAN

Teoriya şoreşa berdewam ya Lenînîst, welatekî ku proleteraya wê lawaz e, şeweyên gengaziyê yê însiyatîfa raperînkariya -ya herî girîng ji bo van gengaziyan potansiyela şoreşger ya gundiyan e- ku ji bo şoreşê dihête bikaranîn. Digel durvê xwe yê çînatî, ya qonaxa mêjûyeke diyar, cudahiya li navbera rola çînatî û qonaxê, bingeha vê teoriyê pêk dihêne. Giranbûna aliyê vîndar (volantirîst) di teoriya şoreşa Lenînîst de, derencama sruştî ya vê cudahiyê ye.

Di teoriyên şoreşê yê Marks û Engels de -ji ber helûmercên heyber yê wê hingê- aliyê nîşander (determinist) yê aborî û civakî, li dûv aliyê vîndar (volantirîst)hêj girantir e. Lê di teoriya Lenînîst de, diyardeya siyasetê ya li hemberî aboriyê girantir dibe. Ango bingeha karbidestîya şoreşger e. (bingehbûna wê ya bi serê xwe nayê wateya ku diyarde ye).

“Siyaset derbirrîna çirrbûna aboriyê ye. Digel giraniya aboriyê jî, nabe pêşrewtiya siyasetê nehête herêkirin. Berovacî vê yekê dihête wateya ji bîrkirina ABC`ya Marksîzmê.” (Lenîn, Berg 42, r: 278, çapa Frensî)

Ji bo karbidestîya şoreşger ya di teoriya şoreşa Lenînîst de, ramana pêşekîdana siyasetê ya bi giranî, têgehîna partiya Lenînîst jî pêk dihêne.Li dûv nerîna Lenîn, wekû rêxistina karkeran û rêxistina şoreşgeran, du şeweyên rêxistinên proleterayê hene:

“Rêxistina Karkeran, berî her tiştî divêt rêxistineke pîşeyî be, heta ku pêçêbibe, dûr ji nihênîyê divêt li ber çavan be. Li hemberî vê rêxistina şoreşgeran, berî her tiştî û yên ku pîşeya wan ya sereke çalakiyên şoreşger in, divêt wan kesan himbêz bike..” (Lenîn, Em Çi Bikin, r: 340)

Li dûv vê têgehîne, divêt partiya proleter bi tevayî ji şoreşgerên pispor pêk were. Partî, rêxistineke cengê ya ku şoreşger pêk anîye. Evan şoreşgerên pispor, “Ew kes in yên ku di babetên diyar de ber bi pisporiyê ve diçin û digel pergala heyî ya civakê hemî têkiliyên xwe birrîne, ne tenê şevên xwe yên vala, hemî temenê xwe ji bo şoreşê terxankirine û herî kêr di rahênan (formasyon) a Marksîst re derbasbûne.” Û di destpêkê de ev partiya ku ji şoreşgerên pispor pêk hatiye cudakirina çînatî nabe. “Li hember taybetmendiya rêxistineke wisa, di navbera karkeran, rewşenbîran û tew di navbera pîşeyên her bi vî rengî, divêt hemî cudahî ji holê bihêne rakirin. Wisa diyar e ku ev rêxistin, zêde nehête berfirehkirin û heta ku ji dest bihê divêt nihênî be”. (Lenîn, Em Çi bikin, r: 140)

Wekû diyar e, di destpêkê de têkiliyên di navbera partî û çînan de bêhtir heyber e; ango bîrdozî ye. Bingeha pêşewatiya partiyê, bîrdozî ye. Di destpêkê de ya girîng, wekû Lenîn dibêje; endamîtiya partiyê ne ku ji karker û xwendevanan, pêkhatina ji şoreşgerên pispor e. Wekû heyber, rêxistineke cengê ku ji şoreşgerên pispor pêk hatiye, nûnertiya vîna proleteriyayê a şoreşger bingeh e. Û bi navgîniya vê rêxistinê têgehiştin dê ji derve bo proleteriyayê bihête gehandin. Ji ber ku ev rêxistin, nûnertiya bizava sosyalîst dike: “Demokrasiya şoreşger ya civakî, bêyî cudabûnê ya girêdayî bi rêxistina proleteriyayê [mebest ji rêxistina pîşeyî ye] ve, nûnertiya Jacobenan dike.” (Lenîn) Ev rêxistin, rêxistineke bijarde ya nîv-leşkerî ye. Ango, di prensîba navendgerî a demokratîk de, ne aliyê demokratîk, aliyê wê yê navendgerî bêhtir li pêş e. (Ev, ji bo tevaya welatên ku demokrasiya birjûwa lênîne derbas dibe.)

“Prensîbên sosyal demokrasiya şoreşger sazûmana pêlikan -hiyerarşîk- ya li dijî demokrasiyê, yan jî, bigotineke din, li dijî xweserî (otonomi)yê navendgerî ye. Evanaprensîbên bi tevayî li dijî berevaniya rojengêrane ye. Prensîba ku yên dawî berevaniyê jê dikin, ji ber ku dixwaze ji bingehê helkişê sergehê, heta bigehiştina otonomî û demokrasiyê herî dûr heye.. Lê, ji ber ku Demokrasiya civakî ya şoreşger tekoşîna xwe ya desthilatê ji jor de dest pê dike, li dijî beşên heyî berevaniyê ji mafê pergala navendê û ji berfirehbûna desthilatê ya békêmasî dike.” (Lenîn, Gavek li pêş, Du gav li paş)

Tevger û rêxistina bijardeya partî ku Lenîn jê dibêje; “Rêxistineke cengê bidin me, em Rûsyayê serûbin bikin” ev e.

Belê, partiyeke ku li dûv prensîbên rêxistina cengê ya bi vî rengî hatiye damezrandin, ji bo bibe rêxistina cengê, di nav tekoşînê de bi berfirehî himbêzkirina cemawerê proleter, merc e. Di qonaxa yekem de, pêdivî bi serjimêriya zêde ya proleterayê tune bû. Ya girîng rewşa wan ya jêdera çînatî çî dibe bila bibe, pêkhatina rêxistinê ji şoreşgerên pispor e. Di qonaxa duyem de, piraniyekemisoger ya ji karkeran merc e. (14\*)

Di sala 1902`an de, Lenînê ku dibêje; pêdiviya partiya berteng bibe rêxistina hindikan, di sala 1905`an de, di nav rêxistina partî de, pêdiviya cihgirtina “bi sedhezaran karkeran” dihêne zimên. “Di sêyemîn kongrê de, di her komîteyeke partiyê de pêdiviya li hember her du rewşenbîran, hebûna heşt karkeran min daxwaz dikir. Êdî dema vê jî derbas bû. Niha, di nav rêxistinên partiyê de, li hember her rewşenbîrekî bi sosyal demokrasîyê ve girêdayî, hebûna çend sed karkerên sosyal demokrat dihtê daxwazkirin.” (Veguhêz; Clif, Rosa Luxemburg, r: 58)

Partî, gava veguhere rewşa partiya cemawerê siyasî yê proleterayê, wê hingê meriv dikare bibêje partî bûye rêxistina cengê. Û endamên vê rêxistina cengê xwedî du rewîştan (karakteran) e:

“Lenîn, pêdiviya sazîbûn û damezrandina partiyê ku li ser du beşan dihête holê, dida pêş:

a) Wekû bingeh şoreşgerê pispor ku ji gorepana karkeran dihên û ji karkerên partiyê yên di astê pêşewatîyê de ne, ango, kadroyeke bi rêkûpêk ya xwedî ezmûn ku ji derveyî xebata partiyê bi hîç karekî din daneketine û ji aliyê teorîk ve têr, di pratîka rêxistinî û di pevçûnên bi polîsên Qeyser re û di rihabûna ji dest wan de hinermend in;

b) Tora rêxistinên partiyeke xwecihî ya berfireh ku destek û hezkirina bi sedhezaran kedkaran qezenckiriye û hejmareke mezin ya endamên partiyê.” (Ji mêjûya Partiya Kominîst a Yekîtiya Sovyetîstanê -PKYS- r.353)

Aha ev e têgehîna rêxistinî ya partiya Bolşewîkan.

Teoriya Menşewîkan ya şoreşê ku bendaveke mîna bedena Çînê di navbera şoreşa

proleterya û şoreşa birjûwa de danandiye, digel pêngava şoreşger ya proleterayê, pêşdeçûna demokrasî û kapîtalîzmê ya li Rûsyayê, heta bipêkhatina piraniya serjimêra poroleterayê ya ji bo demeke nadiyar vehîştîye û her wisa di mijara partiyê de jî reng vedida.

Di nerîna Menşewîkan de, Çîna karkerên Rûsyayê hîna lawaz û belengaz bû. Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsyayê-PKSDR`Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsya` - jî, digel proleterayê girêdana xwe ya zindî -organîk-nedanandibû.Tenê, ji rewşenbîrên ku “di prensîban de nûnertiya karkeran” dikirin pêk dihat. Ji ber vê çendê, ev partî hêj wekû partiya rasteqîne ya proleterayê nedihat heljimartin. (Wekû dihête dîtin, têgehîna Menşewîkî, di qonaxa destpêkê de pirbûna karkeran merc datîne).

Şoreşa birjûwa li Rûsyayê, dê yasabûneke diyar ya birjûwa anîbaya. Ji vê azadiya birjûwa,karkerandigel sûdwegirtinê dikarîn li hev kom bibin. Karkerên ku dê li hev kom bibin, dê sendîkayên xwe, rêxistinên xwe û partiyên xwe pêk anîbana. Erkê rewşenbîrên şoreşger ji bo vê pêkhatêyê alîkarî bû. Têgeheke bi navê partiya şoreşgerên pispor dê nebûya xomaliya Marksîstên ku berevanî ji şoreşa sosyalîst ya şoreşa piraniyê dikirin. Ev têgeh, a Jacobenên ku şoreşgerên şoreşa hindikan û ya şoreşgerên birjûwa biçûk bû. Ev dibe ku bibe ya partiya Blanquistên plangêr, lê nedibû ya ewên ku dixwestin bibe şoreşa piraniyê yaku duçarî palpiştîya cemawer dibe.Tew ewên ku bi binyada xwe ne proleter in û li jêr navê şoreşgerên pispor bi nûnertiya proleterayê û dakokiya wan ya ku dê têgehiştinê bigehînin proleterayê, bi tevayî ne ya berhemhênana ramana Marksîst e. (15\*)

Li dûv nerîna Mîhrî Bellî, yê ku di yekemîn pêngavê de dê proleterayê têbigehîne û birêxistin bike, ne şoreşgerên pispor in. (Ji boyî van hemiyan binerin, Mîhrî Bellî, Şoreşa Demokratîk ya Netewî,rûp: 49-50-51-52).

Wekû rewşenbîrekî sosyalîst (!) Mîhrî Bellî, wekû rêzana jiyana xwe ya bi vê têgehê re durist maye. Ji ber vê çendê, bi dirêjahiya jiyana xwe, bi bûyera birêxistinkirin û bitêgehandina proleterayê hîç, belê hîç giriftar nebûye; ji ber ku li dûv têgehiştina wî ya aborîzaniyê, proleterya dê xwe bi xwe têgehiştî bibe. Erkê sosyalîstên ku ji binyada proleter nahên, ne ji derve birina têgehiştinêye.

Vêca, li dûv vê têgehiştinê, erkê ku dikeve ser milên sosyalîstên mîna Mîhrî Bellî ku ne ji binyada proleterya ne(!), çînên dîtirî şoreşger yê ji derveyî proleterya, bo nimûne, rêxistinkirin û serwextkirina birjûwaziya biçûk e. Û Mîhrî Bellî jî, bi

dirêjahiya jiyana xwe ya siyasî, ji bo bicihanîna erkê xwe bi şêweyekî herî serkeftî “sosyalîstekî” ku bi ser û can xebitiye. Ji bo xebatên wî yên di vê mijarê de, nerîna li pirtûka wî ya bi navê “Nivîsîn” (Yazilar) bes e.

Rêveberiya proleterya, rêveberiya herî demokratîk e. Partiya wê (proleter) jî, partiya herî demokratîk e û bi şêweyekî herî demokratîk ji jêr berew jor dihête damezrandin.

Şoreşa birjûwa ya sala 1905`an ku dê rewşa azadiyê pêk bihêne, ne tenê karker, girseyên gel jî divêt di nav sovyetan de bi berfirehî “non-partîzan” xwe birêxistin bikin.

Ev şarevaniyên ku bi xwe, xwe bi rê ve dibin, digel nûnerên rêxistinên karkeran dê kongreya netewî ya ku derbasî “meclisa damezrêner” dibe, pêk werînin. Her wisa dê bi duristî rewşeke parlementer ya birjûwa li Rûsyayê binex bibê, ew proleterya, bi beşdarîbûna helbijartinên xwecihî yên şarevaniyên ku bi xwe xwe bi rê ve dibin, dê gel ber bi aliyê xwe ve kêşabaya. Û ji ber vê çendê, divêt partî, ji bo tevaya karker û rewşenbîrên sosyalîst vekirî be û berfirehiya wê bihête parastin.

Aha têgehiştina rêxistinî ya Menşewîkan jî ev e.

Wekû dihête dîtin, têgehiştina du rêxistinên ji hev cuda, ji bilî derencama têgehiştina du şoreşên ji hev cuda, ne tiştekî din e.

## V. ŞOREŞA 1905 Û PÊŞBÎNIYA LENÎN YA ŞOREŞA GEL A DEMOKRATÎK

Hêmanên destnîşankirina şoreşa demokratîk ya ku Lenîn pêşbînî dike ev in:

1) Di wardema emperyalîst de, lokomotîfa ku mêjûyê bi pêş de dibe proleterya ye. Ji ber vê çendê, birjûwaziya liberal a Rûsî, êdî mêjû ji dest daye. Pêşewayê şoreşa birjûwa, heta bi dawî, takane çîna şoreşger proleterya ye.

“Proleterya, ji ber rewşa xwe ku çîna herî pêşkeftî û takane şoreşger ya herî durist e, li Rûsyayê, di bizava şoreşger ya demokratîkbûna giştî de, divêt rola sereke bileyze.” (Biryara sêyemîn kongra Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsya, Du Taktîk, r: 80)

2) Hêzên bingehîn yên şoreşa gel a demokratîk karker, gundî û birjûwaziya-biçûk a bajêr e.



“... Hêza takane ya ku li hemberî Qeyser dikare serkeftina misoger bi dest bixe gel e, ango -bêyî em hêza mezin ya bingehîn ber bi çav bikin, heger em birjûwaziya biçûk a bajêr û gundî di navbera van hêzan de belav dikin (ji ber ku birjûwaziya biçûk jî `gel e`)- proleter û gundî ne.”Lenîn, Du Taktîk, duyemîn çap, r: 58)

3) Hêza bingehîn a şoreşger hevpeymaniya karker û gundiyan e.

Em hinekî li ser vê babeta hevpeymaniya karker û gundiyan rawestin. Lenîn, bi ravekirinadevera çolter a Rûsyaya Qeyserî, siyaseta şoreşgerî wisa destnîşan dike:

“Bi rastî, digel amancên xwe yê dûr û nêzîk, li hemberî me ji hev cuda sê çînên civakî hene; maldarên (bi axê ve girêdayî) mezin, gundiyên têr, -hindek gundiyên nîvtêr- û di dawî de proleterya. Di rewşeke wisa de, erkê proleterayê divêt du alî be... Digel birjûwaziya gundî li dijî her şeweyê hişmendiya kolewarî, li dijî feodalîteya çandiniyê; digel proleterya bajêrî, li dijî birjûwaziya gundî û li dijî tevaya hêmanên dîtirî birjûwa; Aha `hêla siyasî!` ya ku proleterya gundî û bîrdozgerê wê sosyal demokrat dê bişopînin, ev e.”(Gundî û Proleterya, Hevpeymaniya Karker-Gundiyan. r: 10)

Û Lenîn, bi daxuyakirina rihabûna digel şoreşa sosyalîst ji gundiyên jar û proleterya çandiniyê re dixwaze bibêje; rêxistina wan, partiya proleterya ye:

“PKSDR (Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsya), wekû partiya çîna proleter, di riya rêxistinbûna wekû çîna serbixwe ya proleterya gundî de, dûr ji mandîbûnê tevbigere, bêyî ku gavekê jî ji bîr bike, bidaxuyakirina hebûna nakociyên di navbera berjewendiyên proleterya çandiniyê ya digel berjewendiya birjûwaziya gundî de û tenê bitekoşîna hevpar ya gundî û proleterya bajaran ya li dijî tevaya civakên birjûwa, ji erka wê ye ku ji tevaya girseyên gundiyên hejar re, digel pêkhatina serkeftina şoreşa sosyalîst ku tenha ew dikare bi rastî jî wan ji hejarî û çewsandinê riha bike, vebêje.” (Berhema navbûrî, r:13)

Piştî ev ravekirinên Lenîn, bûyera hevpeymaniya karker-gundî ya di şoreşa demokratîk a gelê Rûsî de bi duristî derdikeve pêşberî ronahiyê. Hevpeymaniya karker-gundî, wekû di nav partiyê de û ji derveyî partiyê, du alî ye. Di nav partiyê de, digel proleterya bajêr û gundî, hêmanên nîv-proleter û hevpeymaniya gundiyên hejar cihê axaftinê. Hevpeymaniya digel gundiyên dewlemend û nîvçe jî, dê li derveyî partiyê û li ser bingeha çîna cuda bin. Şoreş, dê di encama

hevgirtina hêza partiya karker û gundiyan de dê pêk were. Belê di vê hevpeymaniyê ya di rewşa serweriyê de proleterya ye. Partiya ku dê vê hevpeymaniyê araste bike û di şoreşê de serdestiya xwe damezrîne, partiya çînatî ya proleterya ye.

Derbarî vê mijarê de Lenîn dibêje:

“Di sêyemîn kongra PKSDR(Partiya Karkerên Sosyal Demokrat a Rûsî) de, durîşmeya me ya ku hatiye formîlekirin jî, digel durîşmeyên birjûwaziya şoreşgerên demokratîk û yên komargerî di rewşeke bi aheng de ye. Ev birjûwazî û birjûwaziya biçûk li Rûsyayê wekû partiyeke mezin ya gelêrî pêk nehatiye. Lê, ji bo bigumankeftina ji hebûna hêmanên vê partiyê, ji bûçûnên ku niha li vî welatî rû didin, divêt tiştek nehête têgehiştin. Niyaza me (Di rewşeke serkeftî ya şoreşa mezin a Rûsî de), tenê ne proleterya ku ji aliyê Partiya Sosyal Demokrat ve hatiye birêxistinandin, her wisa birêvebirina birjûwaziya biçûk e jî ku dikare bi asanî bi me re bimeşe.” (Du Taktîk, Çapa duyemîn, r: 46)

#### ŞOREŞ DÊ RÊÇIKEK JI BAJARAN BEREW ÇOLTERAN BIŞOPÎNE

Zordariya Qeyser, di encama serhildana proleterya çekdar ya li bajarên mezin de dê birûxe. Ê şoreş -ji jor berew jêr- ve, ji bajêr berew çolteran dê xwe birêxistin bike.

Lenîn dixwaze wisa bibêje:

“Madem ev bizav di aniha de û ji nihav de gehiştibe duçariya serhildaneke çekdarbûyî: Proleterya, wekû misoger madem di vê serhildanê de dê rola herî enerjîk bilîze û bi beşdarbûna proleterayê, madem li Rûsyayê diyardeya veguheztina çarenûsa şoreşê ye; ji bo çekdarkirina proleterayê, her wisa ji bo serhildana çekdarî û ji bo amadikirina planên pêşewatiya rasterast ya vê serhildanê, heger pêdivî hebe, wergirtina berhingariyên herî enerjîk û bi vê amancê pêkanîna koman ji gernasên taybet yên partiyê.” (Du Taktîk, r: 80-81)

Li dûv nerîna Lenîn, di vê serhildanê de proleterya dê rola sereke bilîze û şoreş, di encama serhildana berfireh ya hêzên bergirî yên karkeran û arteşa karkeran (Arteşa Sor)de, dê bigehê serkeftinê. Belê ji bo pêkanîna serkeftina çîna karker destekdayîna gundiyan merc e.

DESTHITHILATA KU DÊ BIHÊTE DAMEZRANDIN DÊ BIBE DESTHILATA HÊZÊN

BINGEHÎN;

## DÎKTATORIYA ŞOREŞGER YA KARKER Û GUNDIYAN

“Li dijî Qeyser serkeftina misoger ya şoreşê; dîktatoriya şoreşger ya karker û gundiyan e.” (Lenîn, Du Taktîk, r: 58)

Li vêrê, li ser babeteke ku gelekî girîng e bi kurtayî em rawestin:

Xwendewarekî ku her du taktîkan bi hûrbînî bixwêne, dê bibîne ku Lenîn, birjûwaziya biçûk û gundiyan, di nav hêzên bingehîn de tenê carekê heldijmêre. Û ji bilî vê, bi berdewamî wekû hêza bingehîn ya şoreşê tenê proleterayê dihêne zimên.

Wekî din, di prensîbên Lenînîzmê de, Stalîn, di qonaxa şoreşa demokratîk de, wekû hêza bingehîn tenê proleterayê heldijmêre, ji gundiyan jî wekû hêza alîkar vedibêje.

Gelo Lenîn, di wê hevokê de gundiyan û birjûwaziya biçûk di nav hêzên bingehîn de bi şaşî heljîmart? Yan jî ev şemitîneke pêûsî ye?

Helbet na. Digel formîlasyona wê hevoka Lenîn, di nav formîlasyonên dîtirî yên wî bi xwe û ya Stalîn de, nakokiyek yan jî bê ahengiyek tune ye, ahengiyek û wekhevîyek bêkêmasî heye. Bûyer ev e; şoreşa gel ya demokratîk ku di nav de hêzên bingehîn gundî û birjûwaziya biçûk jî hene, bi serhildanên gel yên çekdarî dê li bajaran bi ser bikeve. Di vê serhildanê de, wek çîn, bi beşdarbûna proleterayê dê rola xwe ya herî enerjîk û herî aktîf bilîze. Proleterya bi kêşana girseyên gel bo aliye xwe, di encama serhildana çekdarî de, dê desthilatê bi dest bixe û her wisa dê dîktatoriya karker-gundiyan bihête damezrandin.

Wekû dihête dîtin hêza cemawerî bingeha vê şoreşê çîna karker e. Rola gundiyan ya di şoreşê de, beşdarbûna wekû çîn di pileya duyemîn de ye, paşkok e.

Formîlasyona Lenîn û Stalîn ya bi şeweyê “Proleterya hêza bingehîn e, gundî hêza alîkar e”, bi giranî navendbûna bajaran bo şoreşê û lewra wekû derencama vê yekê, hêza cemawerî ya bingeha şoreşê proleterya yê.

Her ev rewş, di şoreşa nuh a demokratîk ya Mao de, di formîlasyona derbarî çepergêriya çînan de heye. Di formîlasyona şoreşa nuh a demokratîk ya Mao de, carinan “hêza bingehîn gundî ne”, carinan jî “karker, gundî û birjûwaziya biçûk ya

bajaran” dihête gotin. Ev formîlasyona ku di destpêkê de wekû nakok dihête dîtin, her wekû formîlasyona Lenîn ne nakok e. Gava Mao “gundî hêza bingehîn in” dibêje, helbet rola birjûwaziya biçûk a bajarî û bi taybetî jî ya proleterayê biçûk nabîne.

Sedemê formîlekirina wî ya bi vî şêweyî, ji ber ku şoreş bi cenga gel rêçikeke ji çolteran ber bi bajaran ve dişopîne; ango, ji ber cudahiya xala navendê ya şoreşê ye. Ji ber ku girseyên gel yên li çolteran gundî ne, gundî dibin hêza girseyî ya bingeha şoreşê. Ji ber ku gundî hêza cemawerî ya bingeha şoreşê ne jî, formîlasyona “hêza serperîşt proleterya ye, hêza bingehîn gundî ne” dihête kirin.

Digel şoreşa gel a demokratîk ya Rûsî, cudahiya bingehîn ya di navbera welatên mêtingeh û nîv-mêtingeh ku li jêr dagîrkirina emperyalîzmê de ne, ev e.

Ev cudahî gelekî girîng e. Têgehîna şoreşê ya ku her du formilasyon pêşbînî dikin, şêweyê têgehîna rêxistinê û xebatê, ji bingehê de ji hev cuda ne. Û ev cudahî, ew yan ev, ne cudahiyeke duyemîn pileyî ye, hêmana bingehîn e ya ku bîrdozî-siyasî û rêçika me ya çalakiyan vediguhêze. (Di van beşan de emê li ser vî babetî bi şêweyekî berfireh rawestin)

Di formilasyona her du taktîkan de şoreşa bênavberr, ji bo Tirkî jî ku li jêr dagîrkirina emperyalîzmê ye dihête pêşbînîkirin. Diktor Hikmet Kivilcimlî, bi şêweyekî diyar formilasyona di her du taktîkan de, dixwaze bi reseniya çînatî ya Tirkî ve bigoncîne. Bi nerîna li ravekirinên di pertûkên Dr. Hikmet Kivilcimli de, em dighên vê derencamê.

Wisa ku; Dr. Hikmet Kivilcimli di pertûkên xwe de:

Di partiya karkeran de piraniya misoger divêt ji karkeran be. Ji bilî partiya çînatî ya proleter amaje bi hebûna partiyeke gundî, yan jî, bi pêdiviya hebûna wê dihête kirin.

Di vî babetî de Dr. Kivilcimli dibêje:

“Partiya gel ji partiyeke gundî hêj gelekî dûr e.” (Planên cenga gelêrî, r: 19)

“Lê heta bi hindêk bajar û navçeyan û heta bi çend gundan bihavêjtina çend xalên xwerêxistina Partiya Karkerên Tirkî û di nav hindêk rêxistinên bi wê ve girêdayî de, gelek welatîyên karker jî heta nekevin nav wê, piraniyê û rêveberiyê ew bi xwe bi dest nexin, pêdiviya partiya karker bizane ku hîna ji bûyîna PARTIYEKE

PROLETERYAYÊ dûr maye.” (Keza, r: 19, îtalîk yên me ne).

“Di rêxistinê de pirkirina hejmara endamên çîna karker.” [pêdivî ye] (Oportunîzm Çiye?, r: 11, jêrxêz ya me ye.)

2) Helbijartina bajaran wekû gorepana bingeha tekoşîna şoreşger, wekû derencama sruştî ya vê çendê, herêkirina proleterayê wekû hêza bingehîn ji aliyê çepergêriya çînan ve û berevanîkirina ne ji bîrdoziya wê, ji serperiştiya wê ya li karûbar. (Ango beşdarbûna çînan bi herêkirina proleteran wekû bingeha şoreşger ya hêza cemawer). (Binerin, Planên cenga gel, r: 188-189)

Belê teoriya şoreşa bênavêbirr ya marksîst-lenînîst, ji formilasyona du taktîkan heta bi roja me, li hemberî hindêk guherînên jiyane hatine guhertin, bi ezmûniyên nuh zengîn bûye û kûr daketiye. Ev wardema ku em di wê de, ne wardema destpêka qeyranên kapîtalîzmê ye. Tirkî jî wek Rûsyaya Qeyser, ne yek ji 5-6 welatên mezin û mêtînger yê cîhanê ye, tam berovacî, niv-mêtîngeheke li jêr dagîrkeriya emperyalîzmê ye.

Teoriya şoreşa berdewam ya Marksîst-Lenînîst, sînardarkirin û cemidandina bi formilasyona du taktîkan, wergirtina wê mîna modeleke xweristî ku ji bo her wardemê derbas dibe, daxwaza goncandina wê bi reseniya çînatî ya welêt ve, di beşên dahatî de bi şeweyekî berfireh emê bidin xuyakirin ku çawa mirovî dixê guzergaha ladana rastgiriye.

Nêzî modela du taktîkên di formalisyona Lenîn de, bikaranîna di Mihrî Bellî de jî em dibînin. (Ragehandina Partiya Gel ya Komarî -CHP-, wekû partiya gundiyan û bi ser de jî, dazanîna Ecewît -Bulend Ecewît- wekû pêşewayê gundiyan ji aliyê wî ve; bingehdîtina bajaran, hwd.)

Lê niştinandina Mihrî Bellî li cihekî diyar, bi rastî jî sext e. Ji ber ku şivarêyeke wî ya diyar; hêleke wî ya bi xwe re durist, nîn e. Carinan, wekû rastiyeke misoger dîtina pêşewatiya çîna proleter dogmatizm e dibêje, carinan jî, pêşrewiya çîna karker wekû pêşewatiyeke kirdar dinirxîne. Dîsa di hindêk nivîsînên xwe de, li jêr mercên demokratbûna Flîpîn, partiya proleterayê nahête damezrandin dibêje, di hindêk nivîsînên xwe yê dîtir de, kesên ku heman tiştan dibêjin, bi asanî dikare wan bi oportunîzma rastrewî tawanbar bike. Di nivîseke xwe de, nivîsa şoreşgerekî ku gotibû di qonaxa MDD (Şoreşa Demokratîk a Niştîmanî) de, bîrdoziya çîna karker bingeh e, şewandibû; bi canbaziyeke dûr ji aqilan, ji vêya, derencama daxwaza li darxistina şoreşê ya bêyî çîna karker derdixist, li aliyekî din

jî, bi asanî dikare bibêje; çîna karker nebe jî bi serperîştiya birjûwaziya biçûk li darkeftina şoreşê gengaz e!..

Meriv dikare gelek nimûneyên wisa bêhejmar bide.

Bi kurtayî, Mihrî Bellî çî dibêje ne diyar e. Tiştê diyar, nadiyarbûna wî ye. Ew bi xwe, Mihrî Bellî, ji bilî xwe bi hîç kesî û bi hîç tiştêkî (Sosyalîzma Zanistî û damezrênerên wê jî di nav de) ne bawer e, “sosyalîst”ekî “kerametê di xwe de dibîne”. Ew tam “siyasiyekî-reel” yê ku bi dûv hesabê biçûk keftiye. (Di wateya birjûwa de, siyasetmedarekî rastgo ye). Û wekû her siyasetmedarekî-reel, li gopîtkî avarîtiyê mîna mayîneke serserî sergerdan e!

## VI. QONAXA WERARÊ, QONAXA ŞOREŞÊ

Qonaxa werara di Marks û Engels de, bûyera qonaxa şoreşê û mercên heyber yê şoreşê, di ravekirinên Lenîn de bi şeweyekî herî vekirî diyar in. Wardema ku Lenîn tê de jiyaye, ji ber ku serdema şoreşên proleter e û ji ber serpêhatiya du şoreşan, bêguman di vê çendê de rola mezin ya Lenîn heye.

Li dûv nerîna Lenîn, di wardema emperyalîst de, li hemî welatan, bi têgehîna şoreşa bînavbirr mercên heyber yê şoreşên proleteriyayê hene. Astê ku hêzên berhemhênanê li seranserî cîhanê gehîştîyê, ji bo pêkanîna şoreşê stewiyaye. Ya diyar, nebûna mercên şoreşê yê neyber in.

Amdekariyên mercên neyber yê şoreşê, her wisa bingeheên Lenînîzmê pêk dihêne. (16\*) Têgehîştina vê rastiyê di beşên pêş de emê bibînin ku kakila bûyerê ye. Cudabûna qonaxên werar û şoreşê ya Marks û Engels, ji ber cudahiyan rewsên heyber, Lenîn hindek guherîn durist kirin.

Li dûv nerîna Marks û Engels, li seranserî cîhanê gava mercên heyber yê şoreşê hebin, divêt zimanê sosyalîstan bi Frensî be.

Wekû dihête zanîn, serdema emperyalîst li seranserî cîhanê serdema stewiyayî ya mercên şoreşê yê neyber e. Li dûv vaca yekpare, derencama sruştî ya pêşniyarên Marks û Engels, di vê wardemê de, erkê sosyalîstan berdewam axaftina bi Frensî ye, bêtî rawestan, dût ji çavşikestinê, berdewam hêrişkirin e! (Ramana Trotskist ji aliyekî ve ji vê yekê re palpişt e).

Lê ji bo vaca diyalektîkê rews ne wisa ye. Şoreşa cîhanê hergîz dê ne hevwest be. Pêşî dê li welatekî yan li çend welatan bibe. Ji ber vê çendê, proleteriyaya her

welatekî di nav sînorên xwe de, divêt tekoşîneke qonax bi qonax bide. Ji ber ku rizgariya proleterya her welatekî, dê bibe dêrîniya proleterya welêt. Şoreş ne tên hinardekirin, ne jî tên hawîrdekirin.

Li welatekî ji bo hebûna mercên heyber yên şoreşê, ji bilî qeyrana kapîtalîzmê ya li seranserî cîhanê, ew welat di nav xwe de jî pêdiviyê qeyrana xwe ya niştîmanî bijî.

Li dûv nerîna Lenînîst, ji bo di qonaxa şoreşê de be:

a) Têgehiştina proleterya û ji bo şoreşê divêt astê rêxistinê têrê bike. (pêdiviyê mercên neyber yên şoreşê goncayî bin).

b) Hebûna qeyraneke niştîmanî ku bandorê li serdest û li bindestan dike, merc e. (17\*) Ev qeyrana niştîmanî, ji bilî nakokiyên qeyranên giştî yên kapîtalîzmê ku vedana bi şeweyekî herî tûj li wî welatî, ne tiştêkî din e.

Qonaxa şoreşê gaveke kurt e. Qonaxa werarê pêvajoyeke dirêj e.

## WARDEMA WERARÊ

Li dema werarê zimanê mizgotin(xîtab)a şoreşê, Almanî ye. Di wardema axaftina Alamanî de, ji pêngava raperînkariyê (Îhtilalci) re cih nîn e. Şeweyê xebata wê wardemê, serwextkirina proleterya, birêxistinîna wê, xurtkirina têkiliyên proleter bi pêşewayê wê, ji bo şoreşê qezenckirina girseyên gel yên kedkar bo rêzên proleterya û rahênana wê ye.

Heger partiya proleterya hatibe damezrandin, Xebata şoreşgêrane, wê partiye bike partiya cemawerê siyasî yê proleter; bi navgîniya rêxistinên pêşewayê yên cûrawcûr, xurtkirina girêdana organîk bi cemawer re; bilindkirina hişmendiya çînatî ya gelê kedkar û proleterya; bimeşa li aliyê herî çep ya bi berhingariya demokratîk re, bi propaganda siyasî ya berdewam şermendkirina çînan serdest e.

Heger, partiya proleterya hîna nehatibe damezrandin, erka bingeşê pêkanîna yekîneyên pêşewayê yên proleterya ye. Di werareke ku partiya proleterya tune be, digel hebûna rewşa şoreşgêrane jî, nabe Frensî bibe zimanê şoreşgêrane yê proleterya!

Di wê wardemê de, şeweyê xebata şoreşgêrane ya proleterya Lenîn wisa şirove dike:

“Propaganda û têgehandin, têgehandin û propaganda, bi rastî di wê hingê de ji aliyê mercên heyber ve, ji bo plana herî li pêş hatibûn paldan. Xebata ji bo weşana rojnameyeke siyasî ku bi weşana xwe ya heftane arasteyî tevaya welêt wekû pêdivî dihate dîtin, wê hingê, wekû hîmê xebata amadekariya şoreşê dihat xuyakirin (û Em Çi Bikin, bûyer wisa datanî). (Li şûna çalakiya çekdarî), durîşmeya têgehiştina gelemperî, (li şûna serhildanên herêmî), durîşmeya amadekariyên helûmercên derûnî û civakî, wê hingê, tenha durîşmeyên herî durist yên demokrasiya civakî ya şoreşger bûn.” (Du Taktîk, r:79, 2. Çap)

Derbarî taktîka paşvekêşanê a têkçûna 1905-1907`an de, Stalîn wisa vedibêje:

“Di wardema 1907-1912`an de, partî duçarî taktîka paşvekêşanê bû; ji ber ku çalakiya şoreşger sist bibû, pêdiviya bi şoreşê hebû û diviyabû taktîk wekû ji naçarî ev diyarde berçav kiribaya. Wekû derencam rengên tekoşînê û rengên rêxistinê dîsa hate guhertin. Li şûna boykotkirina Dûmayê, beşdarbûna Dûmayê; li şûna çalakiyên eşkere yên ji derveyî parlamentoyê, xebat û destwardanên di Dûmayê de, li şûna grewên siyasî yên giştî, grewên taybet bi aborî yan jî nelivîneke ji rêzê.” (Prensîbên Lenînîzm, r: 83)

Wekû diyar dibe, di wardema werarê de boykotkirina parlamentoyê, destpêkirina grewên siyasî yên giştî, azînan serlêdana her şeweyê çalakiyên çekdarane, ne şoreşgêrane ye.

Di vê wardemê de serlêdana van azînan ji bilî oportunîzma çepgîr ne tiştekî din e. Azînan xebata şoreşgêrane, di serî de proleterya serwextkirina cemawerê kedkar, propaganda, grewên taybet bi aborî ve û berhingariya demokratîk e.

## QONAXA ŞOREŞÊ

Di qonaxa şoreşê de, şeweyê xebata proleterya û durîşmeyên wan bi tevayî dihêne guhertin. Di qonaxa şoreşa 1905`an de, derbarî durîşmeyên qonaxa werarê û taktîkên wê de Lenîn wisa dibêje:

“... Ji ber ku bizavê pêşkeftin tomar kiriye niha rûdanan ev durîşme têperandine; ev durîşme êdî kevn in, tiştine ku hatine bikaranîn û rola xwe bicihanîne.” (Du Taktîk, 2.çap, r: 79)

Ev wardema ku van bîst salan di rojekê de bi cih kir, divêt pir baş bihête nirxandin:



“Demjimêra raperînê gelekî asayî, cudabûna wê ji demjimêrên dîtir yên asayî, cudatirbûna wê ji demjimêrên ku amadekariya mêjûyê dihate kirin û di demjimêrên raperînê de, rewşa derûnî, kelekela ji kevçîka dil ya cemawer, veguherîna baweriyê berew çalakiyê” divêt baş bihête têgehiştin.

Evan rojan, rojên kêr dihêne dîtî ku cemawer bi hev re stranên raperînê dibêjin. Wardem, êdî wardema pêngavên raperîngeriye ye. Di vê wardemê de cemawer tenê ji zimanekî têdighê: Ew jî bi Frensî ye. Û axaftina bi vî zimanî jî pîşeyek bi serê xwe ye... Dilê Frensî, yan jî, rola pêngava şoreşger ya Rûsî li vir giringiya xwe didin xuyakirin. Çend şoreşgerên serkeftî, çend şoreşgerên zanyar yên di wardemên werarê de, ji van pêngavan bêpar man, niha di çirrava neçariyê, newêrekiyê û xiyanetê de melevaniyê dikin.

Di vê wardema kurt de, wek wardema têperbûnê ya navxweyî, wardema hêrişa taktîk û wardema hêrişa stratejîk li ser sê beşan ji hev cuda dibin.

a) Wardema têperbûnê bi Frensiya wê.

Di kêlîka dawîhatina werarê de dest pê dike. Wardema ku hêwaş hêwaş pêlên şoreşê bilind dibin û digel destpêkirina lertzandina cemawerî û digel wardema veguherîna baweriyê cemawer ya berew çalakiyan, taktîka axaftina bi Frensî ye.

Di wardema şoreşa 1905`an de, zarvekirina bangewaziya bi Frensî wisa bû; grewên siyasî yên xwecihî, xwepêşandan, grewên siyasî yên giştî û boykotkirina Dûmayê.

Taktîka Bolşewîk ya vê wardemê jî Stalîn wisa dide xuyakirin:

“Bi xwepêşandan û rêpîvanan, fêrkirina yê serperîşt li ser çalakiyên kolanan û her wisa li paş eniyê sowyet û li eniyê, bi navgîniya komîteyên leşkerî girêdana alîkaran bi serperîştîyê re.” (prensîbên Lenînîzmê, r: 85. Ev beşê ku hatiye veguheztin, perwerdeya têperbûna şoreşa 1917`an ya taktîka axaftina bi Frensî ye).

b) Perwerdeya hêrişê ya taktîkî:

Ev perwerdeya kurt, perwerdeya hînbûna serperîşt ya çalakiyên bajêr, lewra dikare pêşewatiya girseyên gel bike û girseyên gel hînî taktîkên durist bike. Ev qonax, digel bilindbûna berbiçav a potansiyela gelê şoreşger û nêzîkbûna pêlên şoreşê di astê herî bilind de, digel çirrbûna hêrişên taktîk, qonaxa berî hêrişa dawî

ya serperîşt e. Amanca sereke ya di vê perwerdeyê de, peydakirina şepirzeyî û têkçûnê ya di nav rêzên dijmin de, ji hev belawelakirina eniya li dijî şoreşê û vekirina qelşan e.

Taktîkên şoreşgêrane yên perwerdeya hêrişên taktîk yên şoreşa 1905`an, şerên çeperan (şerên kolanan) û gerillayên bajaran ji proleteriyaya bajêr pêk dihên. Wekû, yek ji hindêk erkên gerillayên bajêr, di babeta hînkirina taktîkên serhildana girseyên gel de, Lenîn, nivîsîna xwe ya ji `Serhildana Moskowayê Dersên Bihêne Wergirtin` de wisa dibêje:

“Ji Berfbaranê û hir ve, şerê gerilla yê ku li tevaya Rûsyayê didome û rûdana bizavên herî tund, helbet di hînbûna taktîkên durist yên serhildanê de dê aîkariya cemawer bike.”

c) Perwerdeya Hêrişa Stratejîk; Derbasbûna Arteşa Pergalî û Serhildan:

Di Hîzerana 1905`an de, Lenîn dibêje ku:

“Girjî -xwepêşandan-pevçûnên kolanan, yekîneyên arteşa şoreşger: Aha qonaxên pêşdeçûna serhildanên gel ev bi xwe ne. Êdî em gehiştin qonaxa dawî.”

Qeyrana aborî û siyasî baş kûr daketiye û derkeftiye asta herî bilind. Êdî rawestan, bigotina Lenîn; kujerî ye. Û serhildan, êdî bûye yekemîn xala rojevê. Hêrişa stratejîk ya bi arteşa pergâlî, bi arteşa berhev dihête kirin. Ji bo hêrişa dawî, pêşî hêzên ji hev belavbûyî li cihekî dihêne komkirin, Arteşa Sor dihête afirandin. (Arteşa Sor jî Arteşa Proleter e). Cengên çepergêrî û taktîka gerilla ya bajêr êdî cihê xwe ji taktîka serhildana Arteşa Sor re hiştiye.

Taktîka serhildana Cotyaran -Oktober- Lenîn wisa xêz dike:

“... Ji bo têgehiştina serhildanê ya marksîstwarî, ango, mîna hinerekî bêyî derbasbûna çirkekê, her di gavê de, divêt em sipasalariya giştî ya refên raperînê birêxistin bikin, hêzên xwe dabeş bikin, Hengên cihê baweriyê ji bo xalên herî girîng bihinêrin, şanoya Aleksandra dorpêç bikin, kelha Pier Paul dagîr bikin, derdora salargeha giştî û ya desthilatê bigrin, li dijî xwendevanên leşkerî û leqa hov, li şûna rêdana keftina dijmin bo navendên bajêr yên jiyanewerî, divêt em refên ku ji mirinê re amadene bihinêrin; karkerên çekdar seferber bikin, Ji bo tekoşîna yekcarî û ya herî dawî em gazî wan bikin, her wisa em telefon û telgrafxanê dagîr bikin, divêt em salarê giştî yê raperîna xwe li navenda

postexanê binecih bikin û em wî bi riya telefonê bi hemî karxanan, bi hemî hengan, bi hemî navendên tekoşîna çekdarî ve girê bidin.” (Raperîn û Marksîzm, Tezên Nîsanê û Dersên Cotyaran, r: 167-168)

Aha serhildana sowyetîk pêvajoyeke bi vî rengî dişopîne. Bêguman, jiyan hîç demekê li dûv darijtina tîprêziyê hîç şemayek çepgîr yan rastgîr naherike. Her neyber û şemakirin beşekî rastiyê paşguh dike, beşekî din jî, bivê nevêt dinepixîne. Lê ravekirina teorîk, griftariya jiyanê û piralîtiya wê ji bo têgehiştinê asankariyê durist dike û erka xwe ya rêhberiya çalakiyê bi cih dihêne. Ji ber vê çendê, bi şemakirina me ya van wardeman ya bi şêweyekî mekanîk, bêyî şêweyê cudakirina ji hev, divêt wek pêvajoyeke ku xelekên wê di nav hev de bi cih bûne, bihêne dîtin.

### **Jêrnişe**

1\*) Têgeha şoreşê, di vir de şoreşa proleterya, yan jî, di wateya şoreşa demokratîk ya li jêr desthilatdariya proleteriyayê de dihête bikaranîn.

(2\*)Di şoreşa sosyalîst de, dîktatoriya proleterya; di şoreşa demokratîk de jî, gel dîktatoriya xwe dadimezrîne.

(3\*) Gel têgeheke siyasî ye. Li dûv qonaxa şoreşger kesên ku di nav de dihêne cem hev, kombûna aliyên ku berjewendiya wan, li dijî çînên serdest in.

(4\*)Li dûv nerîna Marks û Engels, heger şoreşeke siyasî veguherîna civakê pêk werîne, her wisa ew şoreşeke civakî ye. Heger pêk nehêne wekû şoreşeke siyasî dê bimîne. Danasîna karkerê kominîst ya di pêşgotina çapa inglîzî ya di Manifest`a 1888`an de wisa ye: “Her aliyekî ku baweriya xwe bi kêmsiyana şoreşên siyasî yê çîna proleter û bi pêdiviya guherîneke giştî ya civakê anîbe, ji xwe re kominîst digot.” (Manîfesto, r: 24)

(5\*)Di serdema me ya nîv-mêtingeh de ev pîvan, li welatên mêtingeh, bigotinên pêşkeftî, anti-emperyalîst, lê di kakila xwe de, digel nûkirina rêveberiyeye ku ji bilî guhertina desthilateke emperyalîst ne tişteki din e, bi rastî jî pêşkeftî, netewperwer, di cudakirina desthilateke şoreşger ya birjûwaziya biçûk de jî têper e.

(6\*) Veguhêr Pomeroy, Cenga Gerîlla û Marksîzm, r: 52

(7\*)Kûrbûna qeyrana civakî: Di civakê de gehiştina sînorê herî dawî yê hejarbûna

kedkaran, ango, di civaka birjûwa de kûrbûna ji hevdûrkeftina çînan e. Têkiliyên berhemhênanê, li pêşberî pêşdeçûna hêzên rençberiyê bûne asteng.

(8\*)Kakila teoriya Troçtkî ya şoreşa berdewam ku dixwest bi Marks ve girê bide, ji kominîstên pozbilind, ya Gottschalk û Weitling`an in. Ango, teoriya şoreşa berdewam ya Troçkist, ne teoriyeke Marksîst e.

(9\*)Ev, di wateya dijberiya Marks ya welatperweriyê de divêt nehête şirovekirin. Li dûv nerîna Marks û Engels, proleterya, li hemî deman û li hemî deran, çî gava welat keftiyê metirsiyê, li eniya herî li pêş şer kiriye. Û divêt şer jî bike. Ji vî alî ve takane çîna herî welatperwer proleterya ye. Marks, digel diyarkirina nebûna welatê proleterayê, derbarî Komina Parîsê de ku desthilateke karkeran e, wisa dibêje:

“Komin, her wisa nûnera rastîn ya tevaya hêmanên civaka Frensa ye û lewra, bi rastî jî dibû desthilata millî ya Frensiyan. Her wisa desthilateke kedkar û wekû şervanê aza yê rizgariya kedê, bi duristayî xwedî naverokeke enternasyonal bû.” (Li Frensayê Cenga Navxweyî, r: 86, îtalîk yên me ne).

Her di vê navberê de, li hemberî vegirtina arteşên Prûsyayê ya ku ala niştîman û millet bilind kir û bi lehengane welat parazt, ne birjûwaziya Frensî, proleterya wê bû. “Serkeftina Parîsê ya li dijî Prûsyaya zordar, dê bibaya serkeftina kedkarên Frensa yên li dijî mijoxwerên dewlet û kapîtalîstên wê. Di vê nakokiyê, li navbera erkên millî û berjewendiyên çînatî de, desthilata berevaniya niştîmanî (desthilata birjûwa), di veguherîna desthilateke xiyanetkar ya niştîmanî de, yek gavê jî dudilî nekir.” (berhema navbirî, r: 46, îtalîk yên me ne)

(10\*) “Teoriya Qûantûm” ya Planck, hîmê fizîka atomî ya nûjen teoriya îzafiyetê ya Einstein pêk anî. Ji bilî vê jî, berhemhênanana peyapey (berhemhênanana peyapey ya trimpêlên Ford), û di nav xwe de berfirehbûna bikaranîna motorên kehrebayî, û hwd.

(11\*) Veguhertina şoreşa demokratîk ya birjûwa berew şoreşa sosyalîst, amaje di hindurê yek pêvajoyê de bi pêkanîna du şoreşan dike.

(12\*) Wekû dihête dîtin, kakila şoreşa berdewam ya Lenînîst ya di wardema emperyalîst de, sosyalîstên welatekî ku şoreşa demokratîk ya birjûwa pêk nehanîye, di encama baweriya bi durvên xwe, bi amancên xwe û bi hevpeymaniyên xwe, di hindurê pêvajoyekê de cenga du şoreşên ku bi giştî ji hev

cuda ne, li dar dixe. Bigotinek din, di wardema emperyalîst de, takane hêza ku dê li van welatan tevan vê şoreşê bi ser bixe, proleterya ye. Ango tenha proleterya dikare bibe pêşewayê şoreşa demokratîk. Û her wisa di wardema emperyalîst de jî, merc çî dibin bila bibin, welatekî ku şoreşa demokratîk a birjûwa li dar dixe, ber bi sosyalîzmê ve ye. Kakila vê şoreşê ev e. Ev tez, ji Lenîn û hir ve wekû di beşên dahatî de jî emê bidin xuyakirin ku kûrtir û zengîntir bûye.

Di wardema emperyalîst de, di konjoktura cîhanê de, rewş çî dibe bila bibe, li pêşberî welatekî ku şoreşa xwe ya demokratîk pêk anîbe, bêyî hebûna warpêçekê, takane rêka ku diçe sosyalîzmê, li Tirkî, li ser navê sosyalîzma zanistî yên ku li dij derdikevin, hene. Nûnerekî vê nerîna ku derbirrîneke dîtirî Menşewîzmê ye û yê ku vê nerînê herî baş formule dike, Mihrî Bellî ye. Li dûv nerîna Mihrî Bellî, danîna bûyerê (Bi rengê ku Lenîn danandiyê) ya bi vî rengî nûsîngerî ye. Û gotina hebûna yekane pêşewayê şoreşê û ev pêşewa jî proleterya ye, dakokî ye. Bûyerê dike mijara bazarê; di şoreşê de, birjûwazî nabe pêşewa, lê dibe ku birjûwaziya biçûk bibe pêşewa. (Binerin, Li Tirkiyê Şoreşa-Dijber, Çepgiriya Tirk, hejmar: 64, r: 21. Aydinlik, hejmar: 9, r: 270 û hwd.)

(13\*) Bi berçavkirina amanca nivîsê, em teoriya şoreşa berdewam ya ku ji civaka sosyalîst heta bi civaka bêçînati didome, ji derveyî ravekirina xwe ya pêvajoya şoreşa çandê, digrin.

(14\*) Ev prensîb, ji bo welatên duçarî li darxistina cenga gel in natêper e. Bigotinek din, di vê pêngava duyemîn de, ji bo van welatan hebûna piraniya misoger ya serjimêriya karkeran ya di nav rêxistinê de, natêper e. Heger cenga gel dê bihête li darxistin, divêt gundiye hejar yên li deverên çolteran bi berfirehî himbêz bike. Li van welatan, di nav kedkarên di nav partiyê de wekû serjimar, gundî ji karkeran bêhtirin. Ev, derencama sruştî ya têgehiştina partiya Lenînîst e ku di pêvajoyê de kûrtir dibe û aliyê Vîndar (Volantirist) yê di teoriya şoreşê de girantir dike.

(15\*) Bûyera ji hundir ve gehandina têgehiştinê û teoriya bedena Çînê parçeyên giştî her yên vê bîrdoziyê ne. Ewên ku bedena Çînê dixin navbera şoreşa birjûwa û şoreşa sosyalîst, hemî deman û li hemî waran, bigotinên veguhêr li dijî gehandina têgehiştinê ya ji derve derdikevin. Ev ne tenê taybet e bi aborîzanên Rûsyaya Qeyser ya salên 1900`an û bi rêkxirawa Menşewîk ya ku bi dûv re ev nerîn herê kiriye.

Menşewîzmê, di hemî wardemên serdema emperyalîzmê de û li her welatî bi çî durvî dibe bila bibe, tevgerêke oportunist ya ku berdewam di nav çepgriyê de gengaziyên cihgirtinê doziye. Wekû li Tirkî, ji teorisyenên bedena Çînê Mîhrî Bellî jî, li dijî gehandina têgehiştinê ya ji derve derdikeve. Li dûv nerîna Mîhrî Bellî, gotina gehandina têgehiştinê ya ji derve şaş e. Lenîn bi xwe jî, ev ramana ku ji Kautsky veguheztiye, carekê tenê, ew jî pir bi kurtayî aniye zimên û careke din tew nehaniye zimên (Ango, Lenîn paşê dev ji vê nerînê berdaye!). Li dûv vê nerînê, Lenîn ne ji gehandina têgehiştinê ya ji derve, ji gehandina navxweyî berevanî kiriye (!).

(16\*) Derbarî amadekirina hêmana neyber ya şoreşê ku bingeha Lenînîzmê pêk dihêne, Dimitrov wisa dibêje:

“Partiya me, bi serperîştîya Partiya Bolşewîk û bi pêşewatiya nemir ya Lenîn, beşdarî damezrandina Enternasyonalê bû. Ragehandina bernameyeke nuh herê kir û şoreşa proleter, ne wekû ji bo amanceke bi dahatûyeke nadiyar ve girêdayî, wekû erkeke girêdayî bi stewîna mercên heyber, bitêgehiştina çareserkirina wê bi hêmanên neyber, anga bi rêxistinkirina şoreşê ji aliyê partiyê bi xwe ve û xwe amadekirina ji bo rêvebirinê têgehişt.” (Di geşekirina Partiyê de Perwerdeyên Sereke, Berew Komara Gel, r: 129)

(17\*) Lenîn, qeyrana niştîmanî (krîza şoreşger) bi vî rengî rave dike:

“Ji bo Marksîstan, ji bo şoreşê, bêyî rewşeke li hevhatî li darkeftina şoreşekê ne gengaz e, bi ser de, hebûna her rewşeke şoreşgêrane rê li ber şoreşekê venake. Di wateya giştî de nîşanên hebûna rewşa şoreşekê çî ne? Heger em van nîşanên bingehîn li dûv hev rêz bikin, dibe ku em helenabin:

1. Bêyî duristkirina guherînekê ya ji bo çînên serdest, gava ku domandina serdestiya wan bikeve tengaviyeke bêdawî, di navbera `çînên li jor` de gava sergêjiyek bi vî, yan bi wî rengî rû bide; ev qeyrana di siyaseta çîna serdest de, kuneke ku dibe sedemê rûdana hêrsbûn û nerazîbûnan vekir, ji bo pêkhatina şoreşekê gelek caran `nexwestin` a jiyana bi şeweyê berê ya `çînên li jêr` ne bes e, divêt `çînên li jor jî`, wekû pêştir `bikevin rewşa jiyaneke bêserûber`.

2. Gava ku tengaviya çînên çewsandî û pêdiviyên wan rewşa xweragiriyê têperand.

3. Wekû derencama sedemên li silal yê ku di dema aştiyê de li hemberî

talankirinê hîç deng dernedixistin û stûxwar diman, lê, di gava ku rewş tevlihev dibe de, hem digel mercên ku qeyran afirandine û hem jî ew bi xwe ji `çînên li jor` serbixwe digel derbasbûna çalakiyeke mêjûyî, gava di kiryarên cemawer de zêdebariyeye mezin peyda dibe, ne bes komik, partiyan yekayek, bêyî van guherînên heyber, bi rêveberiya çînên ku serbixwene jî, wekû yasaya giştî, li darkeftina şoreşekê ne gengaz e. Ji bo guherînên heyber yên van tevan re, rewşa şoreşê dihête gotin.” (V.Î. Lenîn: Ceng û Sosyalîzm, r: 118-119)